

Romanên Nûdem Hezex: Mija mêjî

Teşeyê Bîr û Spîroja Nûdem Hezex eynî ne. Nûdem di nav mij û nediariyê de dixwaze diyarekê derxe pêş. Yanî dixwaze di-yariya nediariyê vebêje. Di Bîr’ê de derketiye rêwîtiyeke derûnî û madî ber bi bîr û daboriya ‘Tu’yê xwe ji Lî û La’yê bibîne. Serlehengên wî ‘Tu’ yan jî ‘Te’ ne... **Yaşar Eroglu / R.5**



Vegotin û honandina senaryoyê

Sînema jî rêbazeke çîrokgotinê ye. Berê çîrok tê nivîsin, paşê ev çîrok bi rêya dîtbarî tê îfadekirin. Ger sînemaya kurdî, çîrokên sînemaya kurdî li ser koka xwe şîn nebe, çavê xwe bide, berê xwe vegeŕîne navendên sînemaya mêtîngeran nikare sîne-mayeke resen derxe holê... **Îlham Bakir / R.11**



xwebûn

26 NÎSAN-2 GULAN 2021 HEJMAR: 71 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org

Namûsa bijehr

Gelo aborî li ser me kengî weke namûsê hat ferzkirin? Namûs kî ye, çi ye yan jî çima her tim namus bûye jina aydê zilamekî? Gelo kes jixwe dipirse? Çawa ku dîroka şoreşan her tim nûjen dibin tên jişin li dijî vê, dî-roka desthildariyê jî her tê dubarekirin. Tenê şêwaz û listokên wan hinek tên guhertin. Mîna xefikê ye, haya we ji we hebe dîsa nekevin xefika desthildariyê! Wê demê ne nif-şên pêşerojê, ne dayikên xwedawend ne jî dîrok tu carê me efû nake. Hezar caran mixabin... Egdî û camêrî di destê cinawiran de maye... jin bi navê namûsê îşken-ceyê dikişînin, lêdanê dixwin, tên te-cawizkirin.... **Roja Welat / R.2**

Ferx û Gilgamêş

Çima Gilgamiş, çima Ferx û Sîtî? Heke bi kurtasî her du destanan hevşibînin, ew jî hevşêweya dest-pêk, herikîn û lêgerîna wateya van her du destanan e. Bavê Gilgamişî mîrê bajarê Urukê ye, nîvxweda-wend e, helbet Gilgamiş jî nîvxwe-dayî ye. Her çend nivê wî xweda be jî nivê din mirov e û destan ji ser trajediya nîvmiroviya Gilgamişî diherike û dikeve lêgerînekê. Bavê Ferxî jî mîrê bajarê Xumaroyê ye. Xuya ye ku bi bandora olan çîrok guheriye, qala xwedayetiya dayik û bavê Ferxî nayê kirin lê belê tiş-tek heye ku hêj neguheriye; ew jî bi saya sêvekê jidayikbûna Ferx û Sîtîyê ye... **Kenan Colemêrgî / R.8**

Ziman tune be şer ji bo çi ye?

Li gelek aliyên cîhanê, di dozên riz-gariya neteweyî de ziman wekî qadeke têkoşînê hatiye qebûlkirin. Ji ber girîngiya wê ya di mobîlîzasy-ona etnîk de, ziman di heman demê de wekî alaveke xwedî hêza siyasî jî hatiye dîtin. Yek ji welatê ku vê rastiya ziman bûye mijara teoriya rizgariyê, Îrlanda ye. Teorîsyenê ziman û siyasetê David Patrick Moran di 1905'an de bi van gotinên balkêş riya şoreşa Îrlandayê nîşan daye: Dema jin û mêrên Îrlandayî ligel Îngilîzî bikaribin bi zimanê Îrlandî biaxivin, wê demê neteweyeke heqîqî ya Îrlandî pêk tê. Êdî ne mimkûn e hêza aboriyê, topên giran.... **Necat Ayaz / R.12**

Hiqûq tê binpêkirin û hemû maf tên astengkirin



Girtiyên siyasî li dijî tecrîdê dest bi greva birçîbûnê kirin û zêdetirî 150 roj in grev dewam dike. Parêze-rên Ocalan her hefte ji bo bi muwekilê xwe re hevdi-tinê pêk bînin serlêdan dikin lê serlêdana parêzeran bi hincetên cuda tên redkirin. Heyeta HDP'ê têkildarî tecrîda li Îmraliyê bi rayedarên CPT'ê re hevdi-tin pêk anîn. HDP'ê têkildarî grev û tecrîdê daxuyanî da û xwest ku tecrîd were bidawîkirin... **R.3**

Tirkiye û bazara çekan

Di qada navneteweyî de li parzemînên cuda bûyerên di-qewimin bi hev ve girêdayî ne. Nakokiyên di nevbera Rûsya û Ukraynayê de û derxistina Tirkiyeyê ji projeya ba-lafirên şer ên F-35 wek du mînakên van pêşveçûnan der-dikev pêş. Di van salên dawî de dewleta tirk... **Felemez Ulug / R.6**

Em bi xwe dîroka xwe binivîsin

Nivîskar Fêrgîn Melîk Aykoç bersiv dan pirsên rojnameya me û diyar kir ku dîrok di destan û stranan de veşartî ye û wiha got: “Ji bo kur-dan mijara herî dijwar nivîsandina dîrokê û romanên dîrokî ye. Ev mîna bi derziyê kolana bîrekê ye. Lewre ne tenê dagirkerên welatê me, her tişt berovajî kirine, dîrokzanên biyanî jî gelek caran ji bo xewnên xwe û balkişandinê çîrokên derêhiş nivîsîne.” ... **Hevpeyvîn Rizoyê Xerzî / R.4**



Şengaliyan û Dayê Şemê rê li ber dagirkeriyê girt

Hêzên artêşa Iraqê xwestin gundê Gir Zerik ê bi ser Til Êzira Şengalê ve dagir bikin. Şengaliyan rê li ber vê hewldanê girt û nehişt gundê wan bê dagirkirin. Dayê Şemê ya ku li dijî artêşa Iraqê bû sembola berxwedanê, bi tena serê xwe li ber pêşve-çûna leşkeran sekinî û ew asteng kirin. Dayê Şemê bi ser leşkeran de qîriya û got: “Yek ji we nikare derbasî Şengalê bibe.”

Aboriya rêxistinkîrî ya li dijî monopolan

Nav, reng û rûçikê pergalê çi dibe bila bibe ji berê ve heyanî niha hatiye dîtin ku xeletiya herî mezin desteseriya milkiyetê ya monopolan e. Milkiyeta qesta me lê ye, tenê xwedîtiya erdê nîn e. Patent û destûrname/ruhsat, qanûnên bêtesîr û bi navê parastina reqabetê riya monopolan vedikin jî di nav çarçoveya dahûrandinê de ye. Li hemberî monopol ango bi qewlê gotina kurdî hûtên aboriyê, gelo divê hel-westeke çawa hebe? Destdanîna li ser nabe encax bi destê dewletê pêkan e û ku ew jî monopalek e. Lê şert û mercên guncav ew in ku rê-xistina civakê di vê der barê de hebe. Çawa gêrik gava ya xwe bikin yek zora filan dibin, rêxistina civakî ji bo vê girîng e. Saziyên sivil û esnaf divê rêxistinên xwe xurt bikin. Yekitiya rênçber û cotkaran gelekî girîng e. Bi riya kooperatîfan, an jî wek saziyên sivil dikarin... **Ehmed Pelda / R.7**

Newayeke efsûnî

Di çîrokên serdemên dêrîn de gelek caran bi dengekî, bi newayeke efsûnî qehreman derbasî cîhaneke efsûnî dibe. Di serî de sawek li ser e, bi gavên sist diçe û paşê wekî xwezaya li ser dimeşe nas kiribe bawerî têyê. Dide pey deng û dest bi rêwîtiyekê dike. Di wê rêwîtiyê de, pêrgî gelek tiştan tê û hêdî hêdî dar û ber û tiştên derdikevin pêşberî wan bi bîr tînin û nas dikin. Ro-mana bi navê Bihušta Xezalan a Eyşana Beravî jî bi wê newaya efsûnî mirov ber bi xwe ve dikişîne... **Sîdar Jir / R.5**



Rexneyên mizahî dike

Rojnameger Ayhan Ūrmiye ku li ser qenala xwe ya YouTube'yê bernamêya ‘Îro Show’ çêdike û bi mîzahê rexneyan li civaka kurd dike, diyar kir ku di medyaya kurdan de valahiya mîzahê heye... **R.11**

Dayika Emîne serewedarnayîşê dejan a

Dayika Emîne sey pêroyê dayi-kanê bi zerrî şikiteyan nêeskaye dejê mêrde û domananê xo, xo vîra bikera û 8ê adare de verê edlîyeya Pirsûsî de tewrê lajê xo Ferît Şenyaşarî çalakîya ronîştîşî ya ‘edaletî’ daye dest pêker-dene. Dayika Emîne çiqas çi-manê xo padena domanê ci-yenê verê çîmanê aye. Senî do-manê xo ardî dinya, senî înan ra hes kerd, senî ê mird kerdî, senî dest bi mekteb kerdî, senî hu-

yayê dayika xo rê, dayika xo senî heskerdêne, senî pîl biyî û heta roja sîyaye ke domanê aye qaşo ‘sîyasetmedarê’ hetê çekdaran ra ameyî qetilkerdene. Nê heme çiyî sanîye bi sanîye verê çîmanê ci de ganî benî û şenikîya doma-nanê xo ra heta roja sîyaye her çî newe ra newe beno. Tu dayi-kêk mumkun nîyo ke domananê xo, xo vîra bikera. Nê çiyî ne vîrê to ra şonê dakiya Emîne û ne zî ti eşkena... **Valêre / R.9**

Namûsa bijehr!

Roja Welat

Gelo aborî li ser me kengî weke namûsê hat ferzkirin?

Namûs kî ye, çi ye yan jî çima her tim namûs bûye jina aydê zilamekî? Gelo kes jixwe dipirse? Werin em bi hev re di nav ziman û dîrokê de gerekê bikin. Lê ji bîr nekin û vê pîrsê jî ji xwe bikin.

Gelo em di hişmendiye de ji bo hinek rastiyan amade ne yan na?

Bi Sumeran re çawa ku dewlet ava dibe hîm û nîrxên herî bingehtî ên civakan jî bi avabûna dewletan re serûbin dibin. Em bala xwe bidin hinek peyvên wek ‘munus-nomus-namus’.

Munus= di dema Sumeran de weke zagonên jinan tê pênasekirin.

Nomus= peyveke latînî ye û wateya xwe aborî ye.

Namûs= ???

Bêguman peyva namûsê, tu wateyek xwe tune ye. Di rastiye de, tiştê ku dewlet di mirovan de ava dike jî ev e. Nasneke, nizanibe lê heya dawî jî koletiyê jê re bike. Mijara jin-civakê jî bi heman awayî ye. Êdî hemû nîrx di bin êrîşeke pir dijwar de ne û êdî hemû nîrx wekî hêram di bin navê namûsê de tên kuştin. Gelo di kîjan zagonan de namûs hatiye nivîsandin yan jî me xwendina wê derbas kiriye? Bi qasî ku dizanim heya niha tu dozger, hiqûqnas an jî parêzerekî negotîye ku namûs zagonêk e yan jî tenê li ser jinan ferz e. Pîr şênber li holê ye ku dema mijar dibe jin, zagon jî maf jî ji nîşka ve diqedin. Gotineke pêşyan di vê keliyê de tê bîra mirov; “YA STAR TU ME BIPARÊZE”. STAR, STAR? Kî bû ev Star? Ya ku di hemû zor û

Diziya ku Enkî ji Înanna dike. 104 me yan jî binavekî din pêşketinên Înanna ê hatin dizîn. Nomus bû namûs li ser bedena jinan hat mehkumkirin

zehmetiyan de, yan jî hemû tiştên tîrsnak de ev kesa ku ne tenê jin hemû civakê hawara xwe digihandê ma gelo ne jin bû? Belêêêê... wê demê em hinek star û bawermendên wê nas bikin. Star xwedawenda şîfa, bereket, rehm, xwezayê û hwd. ye. Di dûaliteya (bandor-bertek) jiyanê de kesek an jî tişteki ku sûdê dide te û te dide jiyan bi nîrx û pîroz e. Mîna pêşengekê bû ku azadiya civakê û zanebûna civakê bi ser her tiştî re digire. Ma gelo ev nabe pîrozî? Civakeke ku xwe di dil û mejiyê kesê de bibîne yan jî bibîne ku ew kes jî bo civakê kar dike berhemên madî-manewî bi pêş dixê, ma gelo ev civak nabe bawermendê wê kesê? Rast e, em pîr pîrsan dikin lê ez di wê baweriyê de me ku pîrskirin gava zanebûnê ya yekem e. Wê demê em vegerin peyva nomusê, ya ku destpêkê berhemên weke xwarin, şînatî, kedîkirina lawiran, her wiha çandîniya demsalê bi pêş dixê jin e. Bêguman tiştên ku me rêz kirin hemû jî beşên aboriyê ne. Di vir de mîtolojiya Enkî-Înanna tê bîra mirovan. Diziya ku Enkî ji Înanna dike, 104 me yan jî binavekî din pêşketinên Înanna ê hatin dizîn. Nomus bû namûs li ser bedena jinan hat mehkûmkirin. Çawa ku dîroka şoreşan her tim nûjen dibin tên jiyan li dijî vê, dîroka desthilatdariyê jî her tê dubarekirin. Tenê şewaz û lîstokên wan hinek tên guhertin. Mîna xefikê ye, haya we ji we hebe dîsa nekevin xefika desthildariyê. Wê

demê ne nîfşên pêşerojê, ne dayikên xwedawend ne ji dîrok tu carê me efû nake. Pîr mixabin... hezar car mixabin... Egîdî û camêrî di cinawirên asê maye... jin bi navê namûsê îşken-ceyê dikişînin, lêdanê dixwin, tên te-

cawizkirin, hêjayî gotinê ye ku ne bi navê namûsê bi navê zalimtiyê... Eh-meqên ku xwe xwediyê namûsê bi nav dikin axxx hêrsa mirov radibe... Egîdî di destê cinawiran de, zilm jî di destê zilaman de ye...



Ber bi ku ve?

Xelata Omerî

Îro, 20'ê adarê ye êvara roja têkoşîna azadî û serfiraziyê ya Newrozê ye. Li gorî rojnameya fermî ya dewleta tirk, desthilatdariyê xwe ji Peymana Stenbolê bi paş ve kişandiye. Li gorî wazên tîr kirin, dê biryarên hîn baştir di rojêva tirkî kevin.

Rexne li Peymana Stenbolê çi dibe bila bibe, rastiyeke heye. Armanca vê lihevhatinê ev e ku rê li ber kuştin û tacîza li hemberî jinan bigire. Ji ber vê yekê jî, li nav tirkan û kurdan jin di

meşan de, bi dengê bilind xwedî li Peymana Stenbolê derdikevin. Vê peymanê jî desthilatdariyê dixwest ku li dijî tacîzên li hemberî jinan hin qanûnan derxe. Lê nebû. Rêvebirên dewletê, bi gotinên nezela û nû derdikevin pêş me.

Li gorî dewleta tirk, jin; dayik, xwişk û kevaniya malê ne. Yanî meskenê wê nav çar diwaran e. Ji her kesî bêhtir kêfa terîqetan ji vê dîsa exlaqê re tê. Ji bo kevani, zarok, ciwan û sîpêhtir be, jinan bi zêr û çehîzê bixemilînin û 'kembera sor' jî piştê jinan girêbidin. Wa xuya ye barê me jinan giran e û girantir dibe.

Piraniya tacîzên li hemberî jinan, ji aliyê 'bekçiyên namûsê', bav, bira, mêr û xizman ve pêk tê. Lê em ji rastiyeke re bûne şahid, perçiqandin û destdirêjaviya li jinan, ji aliyê van 'bekçiyên namûsê' ve bi cih tê. Halbûkî li cihên ku wekhevîya jin û mêr bêhtir e, li cihên ku di jiyanê siyasetê, aborî û civakî de, imkana jinan jî bi qasî mêran heye ku di civatê de beşdar bibe, li wir perçiqandina jinan kêm e.

Munaqeseya li ser Peymana Stenbolê, dişibe pevcûna dîkan. Wê kî bi ser bikevê û ji xwe re bi kar bîne, ma em ê ji ku bizanibin? Lê em tişteki dizanin. Li Tirkiyeyê tacîza li hemberî jinan zêde ye. Tenê di sala 2019'an 474 jin hatine kuştin. Di deh salên dawî de, destdirêjaviya li hemberî jin û zarokan jî sedî 482 zêde bûye. Di navbera 2010-

2017'an de, 263 hezar 750 zarokên keç ên temenê wan 16-17 salî, hatine zewicandin. Di du salên dawî de jî 31 hezar 337 zarok zewicîn. Zewaca zarokan jî sedî 13,5 zêde bûye. Ma kî dikare ji vê rastiye bireve.

Wa xuya ye mesele ne ev e. Di xaleke din de 'şekal li ling dixê'. Li Peymana Stenbolê piştê xwe dide peymanê mafê mirovan a sala 1948'an û gawe baş e. Heger em bixwazin di cihana modern de jin cih bistîne, ev peyman ji bo civatek demokratîk, destkeftêk pêşketî ye. Li gorî hin dîtinan destdirêjî û zora li hemberî jinan, ne wekhevîya jin û mêran qeder e. Lê li dinyaya modern, peymanê mafên mirovan a Neteweyên Yekbûyî wiha dibêje: "Hemû mirov ji diya xwe azad çêdibin û li hemberî mafên mirovan, nîrxên wan wekhev e."

Ne qeder û ne jî peyama NY'ê bi serê xwe tenê tacîz û newekhevîya di navbera însanan de, ji holê ranake. Bala xwe bidin tecrûbeyên tevgera jinan li welatên Skandinaviyê û hin welatên Ewropayê, em dibînin ku jin gerek di xebata sosyal û politîk a nav tevgerên gelêrî de cihê xwe bigire. Li devera wekhevî û serfirazî hebe, zilm û tacîz ji wir direve.

Wahzên dewletê û hêstirên guran, me çend gavan bi paş de diavêje û me balî Erebiştana Siûdî, Afganistan, Pakistan an jî Îranê ve dibe. Helbet terçih ya te ye. Lê hizir û xwestina min, mîna jinên kurd gotine:

"Em ne namûsa kesekî ne, azadiya me namûsa me ye!"

Dilan Aydin

Derbûna dilê me...

Gerdûna ku bi guherînen demsalan re nîşanî me dide ka divê em çi bikin û çawa bin; bi xwebûnî, xweserî, azadî û zindîbûna xwe me bi me re dixê nav lêpîrsînan.

Ez niha ji xwe pîrsa çi me û li ku me dikim. Vê keliyê wekî ku her tişt bi ser min ve tê, tu rê û çareseriyek berbiçav nabînim lê dizanim ku dîtina rê û çareseriyên ji bo min şert e. Dijberî taybetmendiyên gerdûnê yên min li jorê rêz kirin dijm an jî mehkûmê jiyanê me!

Ev aloziya ku xwe di serê min de bi cih kiriye; bêguman ji ber pêknehatina gelek rewş, pêdiviyên jiyanî yên takekesî û civakî ye. Xwe tîk û tenê, bêdeng û bi derdora xwe re bê aheng dibînim. Di nav vê bêdengiyê de tenê dengê dilê xwe yê ku ez dizanim ji sedî sed rast e, rastiya min û jiyanê nîşan dide dibihîzim.

Tenêti çi xweş û jandar e! Ew e ku rêyên pêwîst û dijwar ên jiyanê nîşanî me dide... Tenêti; çi bi êş û azad e. Girêdana me ya bêwate ya bi derdorê re di lêpîrsênên ku çareseriyê ferz dikin re derbas dike. Tenêti êşeke bêpênase ye, birîneke kûr e, derbûna dilê me ye.

Di vê êvara biharê de bi qasî xwişka xwe ya ku 29 sal in di qefesan de girtî ye; xwe dîlgirtî hîs dikim! Bi qasî jana ku dikişîne jandar e jiyan! Vê êvarê bi hesreta dûrbûna wê ji xwe jî ji jiyanê jî ji biharê jî dixwazim birevim! Ji nedîtina biharê xemgîn û hestiyar im. Diviyabû min ev bihar wiha nejiya! Diviyabû ewqas dîlşikestî nebûma lê vayê careke din ji rêwitiya xwe ya hestan 'destvala' vedigerim! Careke din evîn sêwî dimîne. Gelo ev çarenûsa erdnîgariya me ye wiha rengê xwe dide jiyana me?

Bihar e, di strana "Ey felek" a ku Mehemed Şêxo dibêje de hevoka "bi-harên tîhnkuştî" teqez behsa zindanan dike. Helbestvanê hêja Yusif Berazî ku ji xwe re dibêje "Bêbihar" bi gotinên strana "Hebs û zindan" nîşanî me dide ku bihar tîhnkuştî ye û ji ber wê rastiya jandar, navê "Bêbihar" li xwe daniye.

Zindanê, wêranê, warê biharên tîhnkuştî, xeyalên baskşikestî! Te temenê me daqurtand, jiyanê kir jehr! Zindanê! Neyarê biharê, ronahiya çavan, hêviyên dilan, neyarê bedenên ciwan û hemû tiştên zindî. Ka vê demê çavên xwe bigirin û kesên li zindanan bifikirin, bînin ber çavên xwe rûyên wan, roj û şevên wan bibînin, bişînin û ji kûrahiya dilê xwe hîs bikin... Rojê carekê ji 'azadiya' xwe dûr bikevin, xwe di nav dîwarên zindanan, deriyên girtî, şibakeyên dervenedîtî de bibînin. Ka bi hest û wijdana însanî, erda beton û renzeyên hesin bînin ber çavên xwe û bi qasî ku dilê we bişewitîne binêrin, hîs bikin. Îsal jî bihar tîhnkuştî ye, xemgîn û jandar e! Îsal jî xeyal pêk nehatin, bi biharê kîfxweş nebûn, hest û ramannên me wekî ava çem, kanî û mesîlan neherikîn. Heta ku aliyekî me 'dîlgirtî' be; ne bihar, bihar e ne jî jiyan jiyan e!

Ya ku kela dilê me dirijîne çi ye gelo? Bêguman hestên me yên ku bi nivîs an jî axaftinê xwe tînin ziman! Vegotin dibe dermanê gelek rewşan û dema ku em hinek tiştan nakin û nabêjin; ne tenê em pêşî li derbûna dilê xwe her wiha li pêşketina jiyanê xwe jî digrin. Loma divê ku em bi cesaret bin, di demê de bikaribin ya pêdivî bi gotina wê heye bibêjin, an na dawî xewnerêşk, şikestin û poşmaniya gelek tiştan e.



Hemû maf tên astengkirin

Girtiyên siyasî li dijî tecrîdê zêdetirî 150 roj in di grevê de ne. Parêzerên Ocalan her hefte ji bo bi muwekilê xwe re hevdîtinê bikin serlêdanê dikin lê bi redkirina serlêdanan hemû maf tên astengkirin. Heyeta HDP’ê têkildarî tecrîdê bi CPT’ê re hevdîtin kir

Navenda Nûçeyan

Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK’ê girtî ne, di 27’ê mijdara 2020’an de, bi armanca bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan ku 22 sal in li Girtîgeha Îmraliyê ya Tîpa F a Ewlehiya Bilind girtî ye û binpêkirinên mafên mirovan ên li girtîgehan zêde bûne, dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger kirin. Çalakiya greva birçîbûnê bi koma 30’emîn, zedetirî 150 roj in berdewam dike. Çalakiya li Mexmûrê zêdetirî 130 roj in û ya li Yewnenistanê jî zêdetirî 110 roj in dewam dikin.

Parêzerên Ocalan her hefte ji bo bi muwekilê xwe re hevdîtinê pêk bînin serî li dozgeriyê didin lê daxwaza parêzeran bi hincetên cuda tê redkirin. Parêzera Ocalan, Raziye Ozturk anî ziman ku berî her tiştî dema serî li serdozgeriyê didin dixwazin rû bi rû bi muwekilê xwe re hevdîtin bikin û wiha axivî: "Em dixwazin ji ber şewba vîrûsê tedbîr bêne girtin û em rû bi rû bi Birêz Ocalan re hevdîtin bikin. Dîsa em dixwazin li gel mafê telefonê mafên wî yên din ên ragihandinê jî bêne dayîn û parastin. Ji bo mafê li girtîgehên din tên naskirin li Îmraliyê jî bê naskirin em ketin nava hewldanan. Lê ev daxwazên me li dijî hiqûq û zagonan hatin redkirin."

Hiqûq tê binpêkirin

Parêzer Ozturk da zanîn ku hem mafê wan ê hevdîtina bi Ocalan re tê astengkirin û hem jî mafê wan ê parastina mekanîzmaya hiqûqa navneteweyî tê astengkirin û wiha lê zêde kir: "Mînak heta beriya 6 mehan, me der barê naveroka dosyayê de agahî negirtaya jî me li ser dadgehên herêmi agahiyan dosyayê dixwestin. Dema ku agahî nedidan jî me serî li Dadgeha Destûra Bingehîn dida. Lê di rewşa niha de dema muwekilê me cezayê dîsîplinê



distîne jî serlêdanên me têne redkirin. Dema serlêdanên me tên redkirin qala cezayê dîsîplinê nakin. Piştî cezayê dîsîplinê teqez dibin û pêvajoya serlêdana fermî bi dawî dibe û şûnde em agahdar dibin ku cezayê dîsîplinê dane muwekilê me. Piştî ku em fêr dibin cezayê dîsîplênê daye muwekilê me û em dixwazin mudaxilê dosyayê bibin jî vê carê bi "Hincetên ewlehiyê yên razber" agahiyê nadin me. Ev hem li dijî mevzûatên Tirkiyeyê û hem jî li dijî hiqûq û mevzûata navneteweyî ye."

Tecrîdê bi dawî bikin


Berdeвка HDP’ê Ebrû Gunay li Navenda Giştî ya partiya xwe civîna çapemeniyê li dar xist û mijarên di rojevê de nirxand. Berdeвка HDP’ê Ebrû Gunay destnîşan kir ku divê êdî dengê girtiyan ku olan dide were bihîstin û got: "Ev hikûmet di polîtîkayên xwe yên şer de dewam dike. Her ku diçe polîtîkaya xwe ya tecrîdê kûrtir û be-

lavtir dike. Binêrin greva birçîbûnê îro gihiştiye roja 146’an. Ev polîtîkaya tecrîd û îzolasyonê, ev zext û zordarî, ev faşîzm êdî sînorên dawî jî derbas kiriye. Li Tirkiyeyê hemû hikûmetan desthilatiya xwe ewilî li ser girtîgehan ferz kiriye û ji wir dest bi faşîzma xwe kiriye. Îro li girtîgehan mafên sereke yên mirovahiye tên binpêkirin. Dijminatiya herî zêde li girtîgehan tê meşandin. Tu îrade, tu kesekî xwedî rûmet, êdî vê neheqiyê qebûl nake û li dijî van polîtîkayan li ber xwe dide. Saziyên Civaka Sîvil li ser rewşa girtîgehan daxuyanîyekê dan. Hemûyan bang li hikûmetê kir û got; berpirsyar hikûmet bi xwe ye. Daxwazên rewşa yên girtiyan qebûl bikin. Dawî li van polîtîkayên xwe yên tecrîdê bînin. Ji bo rewşa girtiyan zêdetir nekeve xetereyê werin ser rêya edaletê. Rojek berî rojekê werin ser rêya heqîqetê. Tecrîda li ser birêz Ocalan rakin û pergala Îmraliyê êdî bi dawî bikin."

Heyeta HDP’ê bi CPT’ê re hevdîtin kir

Hevberdevkên Komîsyona Pêwendiyên Derve yî yên Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Feleknaş Ūca û Hişyar Ozsoy, der barê şert û mercên tecrîdê de ku li Îmraliyê berdewam in, bi rayedarên Komîteya Pêşîlêgirtina Îşkenceyê (CPT) re hevdîtin kir.

Civîn li bajarê Strasbourgê yê Fransayê pêk hat. Di hevdîtinê de hevberdevkan bal kişand ser tecrîda li ser rêberê PKK’ê Abdullah Ocalan û behsa astengkirina hevdîtina bi malbatê û parêzeran hat kirin. Her wiha grevên birçîbûnê yên ku li dijî tecrîdê dest pê kiribûn û binpêkirina mafan li girtîgehan hatin nîqaşkirin. Der barê rewşê de daxwaz û pêşniyazên dualî hatin parvekirin.



Gultekîn jiyana xwe ji dest da

Girtiyê nexweşê pençeşêrê Îsa Gultekîn ê 67 salî yê li Girtîgeha Tîpa T a Hejmara 3 a Tarsûs Mêrsînê girtîbû, li Nexweşxaneyê Dewletê ya Tarsûsê jiyana xwe ji dest da. Malbata Gultekîn, piştî karûbarên li girtîgehê bi dawî bûn cenazeyê Gultekîn ji morgê girtin, anîn Mêrsînê. Cenazeyê Gultekîn li Goristana Guneykentê hat definkirin. Gultekîn 28 sal berê ji aliyê Dadgeha Ewlehiya Dewletê ya Meletiyê ve hatibû girtin û cezayê girankirî yê heta hetayê lê hatibû birîn. Gultekîn ê 28 sal in girtîbû li gelek girtîgehan mabû. Tumorên di pankreas û kîsikê zirav de derbasî tevahiya bedena Gultekîn bûbûn û hat zanîn ku ew ê piştî 18 mehên din bihata berdan. Hem malbatê û hem jî Şaxa ÎHD’ê ya Mêrsînê, li ser giranbûna rewşa Îsa Gultekîn hefteya borî bang li rayedaran kiribû, lê ligel hemû hewldanan jî nehatibû berdan. Hêjayî gotinê ye ku li girtîgehên Tirkiye û Kurdistanê bi sedan girtiyên nexweş hene û rewşa gelek girtiyên nexweş giran e. Ligel serlêdan û raporan girtî serbest nayên berdan.

MÊRSÎN

Kovara Zrîngê êdî çap nabe

Yekem xêzeromana kurdî Zrîngê di cotmeha 2019’an de bi zarawayên kurmancî û kirmancî, bi 32 rûpelan û bi awayekî mehane dest bi weşana xwe kir. Di warê kovageriya kurdî de wekî xêzeromana yekemîn cihê xwe girt û heta demekê berdewam kir. Kovara Zrîngê ku li Amedê derdiket piştî hejmara xwe ya 12’an dawî li weşana xwa ye çapê anî.

Kovara Zrîngê heta hejmara 6’an weşana xwe domand lê ji ber şewba koronayê bi awayekî mecbûr ma ku navber bide weşana xwe. Zrîngê piştî 7 mehan vê carê bi formateke nû dest bi weşana xwe kir. Kovara ku berê wekî xêzeroman derdiket vê carê di çarçoveya kovareke mîzahî û qerfî de derket. Zrîngê heta dawî li weşana xwe bîne cih da gelek xêzkaran. Kovar bi temamî 12 hejmar derketin.

Kovara Zrîngê vê carê jî ji ber rewşa pandemiyê mecbûr ma ku weşana xwe ya çapkirî bi dawî bike. Ji ber ku rêjeyên nexweşiyê her diçe zêdetir dibin kovara Zrîngê nexwest xwendevanên xwe bi talûkeya nexweşiyê re rû bi rû bihêle. Bi vê yekê re jî şert û mercên aboriya kovarê jî derfeta domandina weşanê neda ku Zrîng dewam bike. Di demên pêş de, bi bidestxistina şert û mercên erênî û li ser daxwaza xwendevanan ekîba kovarê dibe ku xebatên xwe yên dijîtal û an jî şêweyekî din berdewam bikin. **AMED**

Nahêlin jin neheqiyan bînin ziman

Navenda Nûçeyan

Bazara Taxê ya Jiyane ku jin lê firotinê dikin di sala 2013’an de ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê ji bo jinan hatibû avakirin. Piştî tayînkirina qeyûm dixwazin esnafên mêr jî li Bazara Jiyane bi cih bikin. Li dijî van polîtîkayên qeyûmê heya niha jinan bi têkoşîna xwe nehiştin ku mêr li bazara wan werin bicihkirin.

HDP’ê di hilbijartina 31’ê adara 2019’an de bi rêjeya ji sedî 71 şaredariya Rezanê qezenc kir lê mazbataya Zeyyat Ceylan bi hinceta ku ji KHK’yan ji kar hatiye derxistin nedanê. YSK’yê mazbata Ceylan da namzetê AKP’ê Huseyin Beyoglu. Meclis û endamên şaredariyê, serokên 3 bazarên taxê û Beyoglu civîn pêk anîn û biryar girtin ku dê li Bazara Taxê ya Jiyane 400 mêran bi cih bikin. Di civînê de biryara ku dezgehên mêran 4 metre, yê jinan jî 3 metre bin, hat dayîn. 258 jinên ku li Bazara Jiyane dixebitin, li hember vê biryarê bertek nîşan dan û diyar kirin ku ew naxwazin mêr li

bazara jinan werin bicihkirin.

Bazar ji bo jinan hatiye avakirin

Jinên ku bi boneya bertekên bicihkirina mêran ji çapemeniyê re axivibûn ji alî rêveberiya şaredarî û rêveberiya bazarê ve hatin hişyarkirin. Xebatkara Bazara Jiyane Rabia Ataş yek ji wan jinan e ku hatibû hişyarkirin. Ataş ji me re behsa mijara bicihkirina mêran, bertekên xwe û hişyarkirina ku li wan hat kirin, kir.

Rabia Ataş di destpêka axaftina xwe de bi bîr xist ku bazar li ser navê jinan hatiye vekirin û wiha got: “Ev projeya Bazara Jiyane ji bo hemû jinan mînak e. Dema ku bazar hat avakirin hevalên me yên jin gelek zehmetiyan kişandin û bazarê anîn heya îro lê ew dixwazin vê bazarê jî wek hemû destkeftiyên me ji me bistînin. Jinên ku di vê bazarê de danûstandinê dikin maxdûr in û li gelek kesan mêze dikin. Qeyûm, rêveberiya bazarê, midûrê zabîtayê bi hev re bêyî biryara me li hev kirine ku mêran li Bazara Jiyane bi cih bikin. Daxwaza wan ew e ku me bi birçîbûnê terbiye bikin lê heya niha li

vî welatê gora tu kesê ji birçîbûnê nehatiye kolandin. Li her deverî bazarên mêran hene me rojekê jî çav berne-daye bazarên mêran. Em dixwazin gel vê neheqiya wan bibîne.”

‘Em li bazarê mêran naxwazin’

Di dewama axaftina xwe de Ataş diyar kir ku wan xwestiye li ber şaredariyê çalakî bikin û wiha pêde çû: “Dema me xwest biçin ber şaredariyê û bêjin ku em vê biryara we qebûl nakin, rêveberiya bazarê got ku bila Reyhan Aktar (Seroka DÎKAD) bê û em ê biaxivin. Hat lê ew jî bi zimanê wan axivî. Ji me re gotin ku em ê dezgehê we firehtir bikin, dixwazin me bi van tiştan bidin sekinandin. Armanca me ne firehkirina cihê dezgehê ye em naxwazin mêr werin Bazara Jiyane.”

Hatine hişyarkirin!

Her wiha Ataş diyar kir ku çendek bere ji ber jî çapemeniyê re axiviye ji aliye midûrê zabîtayê ve hatine hişyarkirin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Îro ez li vir behsa van neheqîyan dikim lê ez nizanim dê sibê çi were



serê min. Ji me re gotin hezar û 500 TL’yên xwe bînin werin em ê cihê we di noterê de diyar bikin. Dema em çûn min û sê hevalên min ên din birin odeya midûrê zabîtayan. Li wir ji me re gotin, hûn bi çapemeniyê re axivîne em ê li we doza tazmînatê vekin û pereyên me çar kesan negirtin. Di roja dawî ya ji bo serlêdana ji bo cih de hê navê me qebûl kirin. Me jî çapemeniyê re behsa neheqiya ku li me kirine, kir. Tiştên ku me got ne tomet e û ne jî heqaret e.”

HER ZIMAN BI SERÊ XWE NÊRÎN Û TÊGIHÎŞTINEKE CÎHANÎ YE

Dîrok di destan û stranê de veşartî ye

■ Rizoyê Xerzî

Der barê kar û xebatên nivîskar Fêrgîn Melîk Aykoç de, her wiha nêrînên wî yên têkildarî romana kurdî, kurdên bi zimanekî din dinivîsin û hin mijarên din, me sohbetek ji bo xwînerên roj-nameya xwe amade kir.

Zarokatiya te ji wekî ya piraniya kurdan di nav xizanî û koçberiyê de derbas bûye. Piştî ku tu bi salan li Ewropayê jiyayî, ji wê jiyanazarokatiya te herî zêde çi tê bîra te û tişta ku ji jiyanazarokatiyê heta niha bandora xwe li jiyanazarte dike çi ye?

Kalikê min bi guleya dagirkeran hatibû kuştin, her wiha gelek merivên me jî li Dêrsimê hatin kuştin. Ew êşa sewîtiya bavê min a siya xwe berdabû ser gîyanê min tu car pêşîra min berneda, piştî erdheja Gimgimê (1966) ez çûm dibistana Mamosteyî ya Manîsa Demîrciyê. Li wir tim şerê me û zarên rûman ên ku ji xwe re tirk digotin hebû, ev her du diyarde her û her bûn hêza niştimanperweriya min.

Di salên pêncî û şeştî de, lîwana xaniyê bamariyê bavê min zivistanan weke dîvaneke çandê bû. Li wê lîwanê çîrokbêjan çîrokên dirêj, yên bi helbest û stran vedigotin, em zarok jî li pişt derî rûdiniştin û me ew çîrok guhdarî dikirin. Çîroka wê demê bandoreke mezin li min kiribû çîroka “Şêxmûs û Sindiyân” bû. Jê beşeke stranî: “Geliyê Kelareşê bişewite wa bi sinc e /Doh vê çaxê heft birayê min li pişta hev bûn îro du jê çûne, mane pênc el!” Piştî lêkolînan min dît ku ew çîrok serpêhatîyeke rast e. Her wiha çîroka Comerd jî çîroka Gaumadayê neviyê Aştiyago ye. Ji wê hê jî di nav lêkolînan de me.

Xebatên te yên der barê rêzîman de jî hene. Li gorî te bi kurtasî pirsgrêkên sereke yên rêzîmanazakurdî çi ne?

Her ziman bi serê xwe nêrîn û têgihiştineke cihanî ye, yanî ziman xwedan pergaleke xwerû û sistematîk e. Qelsî û kêmasî ne di ziman û pergala zimanan de ye, kêmasî yê axavêran e. Ji zimanê xwedî pergaleke bêkêmasî yek jî, zîmanê kurdî ye. Mînak di kurdî de hemû lêkerên têper û têneper jî hev diqetin, mijara zayendê ji zimanên din zêdetir xwedanê hin rêgezan e. Pirsgrêk ne ziman, pirsgrêk kesayetiye û ser ziman dixebitin bi xwe ne. Lewre yek bi têgihiştina tirkî, yê din bi têgihiştina erebî nêzîkî ziman dibe. Hin ji devoka herêma xwe wek navenda zimanê kurdî digirin, rastiyên di devok û zaravayên din de nabîne. Yanî nikare bi giştî li ziman binêre, pirsgrêk ev e. Lê êdî akademîkerên bi zanyariya ziman

nêzîkî ziman bibin gelek in. Divê kes bi serê xwe hin rêgezan weke kelem daneyne pêşiya ziman. Mînak bi “paşeroja” heremî, “pêşeroj û paşeroj” teklihev kirin. Bila pêşîra ziman berdin, pergala ziman di pêvajoya nivîsandin û perwerdeya zanistî de bi xwe rûdine.

Tu dikarî ji keremazxwe, hinekî behsazazmûnazxwe di nivîsînazromanê de bikî û bi giştî mirov çawazdikare taybetmendî, şewez û terzazromana kurdî bi nav bike, ev azzmûn di çi pêvajoyan re derbas bûye?

Li her welatî azzmûnên cuda yên pêşketina romanê hene. Ev bi şeweyazvegotin û bi dîroka gelan ve girêdayî ye. Ji wê jî sedî sed texlîtkirin ne rast e, yan jî ez rast nabînim. Di nav civakazkurd de, vegotinên çîrok, mesnewî û destanan xwedan taybetiyan e. Ji destana Memê Alan bigire heta Dewrêşê Evdî, ji stranên dengbêjan bigire heta çîrokên bi çend demjimêran dikudin, her yek xwedan awayekî vegotinê ye. Mînak, min romana “Serwerê Med Aştiyago” li ser bingehe vegotina destana Memê Alan nivîsî. Romana “Asoyên Dînan” jî li ser bingehe vegotina çîroka “Şêxmûs û Sindiyân” nivîsî. Bêguman mirov dikare şeweyên li cîhanê hene; weke modern, postmodern jî bi kar bîne, lê divê di wan de jî, şeweyê vegotina kurdî serdest be. Her wiha divê rengê xwezazanane, lixwekirin, ken û henekên kurdî lê hebe. Her gelî piraniya dem, rûdan û kesayetiye dîroka xwe kirine roman. Dîroka me ji ya her gelî bijantir e, divê em bi kêmasî di romanazde wan êşên dîrok û civakê vekin. Gelên din jî demazdestpêkazromanê bigire, heta post-modernîzmê di her demê de roman nivîsandine. Ji ber rewşazme û welatê me, me dereng dest pê kir. Me nekarî em anegorî demazroman biafirînin, ev jî xweber bû egeraztêkilhevkirina klasîk, modern û postmodernîzmê.

Her wiha di romanê de şeweyê vegotinê, rewş û cîhanaztêgihiştina karekteran, têkilîye û navberazkarekteran de, dem, cih û warê ku roman li ser rûniştî, şayesandin, biwêj, gotinên pêşiyan, forma ken, girî, şîn û baneşan, awayê axaftinan rengê romanê diyar dikin.

Demazmeriv li serhatîyazte yazromanê dinîhêre, meriv dibînazku berê te bêtir li nivîsandina bûyerazango romanên dîrokî yez. Gelo di nivîsandina romanên dîrokî de zehmetiye çawazli benda nivîskar in?

Ji bo kurdan mijara herî diwarznivîsandina dîrokê û romanên dîrokî ne. Ev mînazbi derziyê kolana bîrekê ye. Lewrazne tenê dagirkerên welatê me her tişt belovajî kirine, dîrokzanên biyanî jî gelek caran ji bo xewnên xwe û

Ji bo kurdan mijara herî diwarznivîsandina dîrokê û romanên dîrokî ye. Ev mînazbi derziyê kolana bîrekê ye. Lewre ne tenê dagirkerên welatê me, her tişt berovajî kirine, dîrokzanên biyanî jî gelek caran ji bo xewnên xwe û balkişandinê çîrokên derêhiş nivîsîne


balkişandinê çîrokên derêhiş nivîsîne. Mînak; Herodot, Aştiyago wekazcinawirekî nişan daye, lê Xanephon di Kîropedya xwe de Aştiyago wekî Miroveke Kamil û pêxemberekî venivîsandiye. Di çavkaniye ermenan de jî Aştiyago wek kesayetiye kî xwe-dayî hatiye venivîsandin. Rastî jî ev e. Di xebata rêzdar Ezîzê Cewo “Zerdeşt Pêxember û Rûpelên Dîroka Wend-abûyî” de zelal dibe ku Aştiyago li ber destê Zerdeşt Spîtama xwendîye.

Hin kesayetiye kurd yên dîrok nivîsîne jî, bi giranî çavkaniye dagirkeran bi kar anîne. Mînak, Darios I. (Dara Yawuş Arşama) wek kurd, bavê wî Hîstaspayê xwînxwar jî pîroz nişan dane. Lê Darios I. bi xwe rêberên eşîrên Medan ên wek Fravartîş, Çîçan Taxma, Stran Taxma, Pîr Martî, Vahiya Data û û dîl girtî di rolyefên Bestûnê de nişan daye û di bin de jî wehşeta xwe û bavê xwe Hîstaspayê hov bi vegotineke bê wijdan bi “medî, elamî û akadî” daye nivîsandin. Mixabin ku di berhemên ku hin kurdan bi navê dîrokê nivîsandine de ev rastî tune ne. Li gel vê rastiyê, divê kesên dîrokê dinivîsin, çîrok û destanên kurdî pir baş bizanin. Mînak, Mîtolojiya Kurdên Êzdî Gomerd, çîrokên li Serhedê wek Comerd, Gamor, Gayê Mardo çîroka Pîr Gaumada yê di serhildanên li dij Darios I. de rêberî kiriye bixwe ne. Di gişan de pîrekî kamil li dijî qralek zalim şer dike. Memê Alan destana Alyanîs û Aştiyago ye, bi ihtimaleke mezin berê bi destê şagirtê dengbêjê Aştiyago Angares ve hatiye stran. Yanê dîroka me, bi giranî di çîrok, destan û starnên me de veşartî ne.

Em werin nivîsandina romanên dîrokî. Belê romanên dîrokî lêkolînen gelek berfireh û zanînazçîrok û destanên gel dixwaze. Demazev her du nebin, nabe. Ev jî bi salan dikudîne, mejiyekî zelal û hûrkolînî dixwaze. Divê mirov bikare di nav vê geremolaztevlîhevkirina dîroka me de, ji hevok û gotinên dikarin hin rastiyazdi xwe de werbigirin rastiyê derxîne. Ez bixwe hemû lêkolîn û nirxandinên dîrokzanên ewropiyan, ser û bin dikim, ji dostên li Erîvanê xwendine sûd werdigirim. Hewl didim ku rastiyên bi koneî hatine veşartin ta bi taz verişînim û derxînim.

Ji bo kurdekî ku bi zîmanekî din dinivîse her çendî mijarazwî kurd be jî mirov dikare bêje ew nivîskarekî kurd e ?

Nivîskareke/î bi kîjan zîmanî binivîse, ew nivîskare wî zîmanî ye û di



xîzmeta wî zîmanî de ye. Xwerû yên bi tirkî nivîsandine û dinivîsin bi sedan biwêj, gotin, hevok, gotinên pêşiyan, çîrok û formên vegotinên kurdî wergerandine û kirine xîzmata zîmanê tirkî. Her wiha, gelek çîrok, mîtolojî, awayê vegotinan jî ji zîmanê serdest yan jî yê pê nivîsandine re kirine mal. Em mînakek balkêş bidin: Yaşar Kemal destana “Hespê Gola Sîtilan” yagelê kurd, bi tirkî di bin navê “Agri Dagî Ef-sanesî” de nivîsiye. Ev wergerandine al-manî. Di civîneke almanan de me çendî hewl da jî almanan gotin: “Ev bi tirkî nivîsandiye û ev efsaneyeye tirkazel! Ka belgeyên we yên nivîsandî?” De kerem bikin!?

Her çendî Yaşar Kemal tazcarê kurdbûnazxwe û jî kurdî û wêjejazkurdî sûdwergirtina xwe înkaznekiribe, mijare û naveroka romanên Yaşar Kemal jî jiyanazkurdan be jî, ew bi berhemên xwe di xîzmata zîmanê tirkî de ye û nivîskarekî tirk e û hew. Mirov nikare wî weke wêjevanekî kurd destnîşan bike.


Mijara Selîm Berekat: Ti tişteke Selîm Berekat ne kurd e û ne jî kurdî ye. Min der barê wî de dîtinên gelek kesayetiye Rojvazgirt û min bixwe jî lê kola. Camêr bê çend gotinên biyaniyekî jî dizane, bi kurdî nizane. Tim gotiye; “Zîmanê erebî mala min û gîyanê min e.” Di romanên xwe de hin navên kurdî yan jî karekterên kurdî bikaranîn nayê wê wateyê ku naveroka berhemên wî kurdî ye, lewre zîman ne zîmanê kurdî ye. Di hemû film û rêze-filmên tirkaz û mijareyên qeşmerî yên tirkazde jî, navên kurdan weke “Remo, HesozSîla û hwd” tèn

bikaranîn. Hem jî yên bi kar tînin ne -kurd in. Nivîskare alman Karl May jî di roman xwe yavavdar “Durch Wilde Kurdistan” (Di nav Kurdistanazhov re) de behsazhin cîharên kurdan dike û hin navên mirov û herêmên Kurdistanê bi kar tîne. Yazerî girîng jî navê Kurdistanê bi kar tîne. Niha em rabin ji ber vê bikaranînê bêjin Karl May kurd e? Na. Bi gotineke hişk Karl May çîqas kurd be, Selîm Berekat jî ewqas kurd e û hew. Yanî bi gotineke kurt nijadkurdbûnaznivîskarekê/î taztiştekî naguherîne. Kî bi kîjan zîmanî binivîse ew nivîskare wî zîmanî ye.

Tu dikarî hinek behsazxebatên xwezên lêkolînen dîrokî bikî?

Ev nêzîkî tazsalan in, di roj-nameya Yêni Ozgur Polîtîkayê de her hefte keleheke ji demazÛrartûyan maye, bi lêkolînen arkolojîk ve didim nasandin. Diwarzariya min ne di warê zanistiye û -arkolojîk de ye, di wî warî de gelek agahiye arkoloog û tîzên doktorayê hene. Li gel wê ez jî êdî hînî karekterên lêkirina dîwar û bi giştî avahiye kelahên Xaldiyan/Ûrartuyan bûme. Arkolo-gek bi qestî şaş jî binivîse, ez li karek-terazterastî û bicîhkirina kevîran dinêrim û derdixim. Diwarzariya herî mezin navê kurdî yên girên keleh li ser in ku gelî û newalên li dor kelehê çem û çemokên di ber kehehan re di-herikin. Ez hewl didim bi telefon û alîkariya nasazwan bi dest bixim.

Wek encam; bi hêviya min karibûye, bersivên pirsên we bidim; gelek spas ji bo vê hevpeyvînê. Ji we xebatkarên Xwebûnê re serkeftin.



Fêrgîn Melîk Aykoç kî ye?

Fêrgîn Melîk Aykoç di sala 1951'ê de li gundê Baskan yê navçeya Gimgimê ya Mûşê tê dinê. Sala 1972'yan dest bi mamostetiye dike. Di sala 1980'yi de tê girtin û 17 roj di îşkenceyê de dimîne. Piştre tê berdan û neçar dimîne koç Almanyaê dike. Romana wî yazekemîn Mamostên Zînanan di sala 1999'an de, romana Dîlên Li Ber Pûkê di 2002'yan de hatine çapkirî û romana wî yaszêyemîn û xebata wî yalî ser rêzîmanazkurdî jî li ber çapê ne.

Romanên Nûdem Hezex: Mija mêjî



Yaşar Eroğlu

Vê nîrxandinê li ser du romanên Nûdem Hezex dikim. Di demên pêş de min ji bo hevpeyvîna Nûdem Hezex di malpera Welat de gotarek nivîsibû. Wî di hevpeyvîna xwe de behsa romana xwe Bîr û Spîroj kiribû. Ji bo neheqiyê nekim nîrxandina min tenê di çarçoveya hevpeyvînê de ma. Min hêja dît ku romanên wî bikirim û bixwînim. Pê re jî vê yekê dest da ku ez vê nîrxandinê bikim.

Romana Bîr ji weşanxaneyê Da-rayê derketiye, 118 rûpel e. Spîroj ji weşanxaneyê Payîzê derketiye, ji 143 rûpelan pêk tê. Nûdem Hezex bo xwe terz û teşeyek dîtîye, pê dinivîse. Ev teşe dişibe hin nivîskarên di demên nêz de dest bi nivîsandina romana kurdî kirine.

Teşeyê Bîr û Spîroja Nûdem Hezex eynî ne. Nûdem di nav mij û nediya-riyê de dixwaze diyariyekê derxe pêş. Yanî dixwaze diyariya nediya-riyê ve-bêje. Di Bîr'ê de derketiye rêwîtiyeke derûnî û madî ber bi bîr û daboriya 'Tu'yê xwe ji Lî û La'yê bibîne. Di her du romanên de jî serlehengên wî 'Tu' yan jî 'Te' ne, eger Lî û La'ya heta dawiyê nepen bidine aliyekî. Balkêş e ku lehengên Hezex jî heta ji dest hatiye nepen kirine. Roman darîçav dest pê dike, paşê dibe mij, dîsa ji nav mijê derdikeve darîçav dibe û bi vê teşeya hînkirî berdewam dibe, diçe; bi qewlê vegotina wî bixwe 'diçe û naçe, naçe û diçe û qe naçe'. Nivîskar Bîr bi du cînasan yanî heman peyv bi du wateyan de bi kar anîye. Yek bîra ku di serê me de ku derûnî û hafizayê jî îfade dike. Ya din jî bîreke madî ya avê ye ku dixwaze her du bîran bi hev girê bide. Ji bo dagirtina romanê ji ber çî ew qas tirkî, di cih de ne di cih de, bi kar anîye mirov fêhm nake. Dibe ku ji bo 'Tu' jî tirkî vegeriyaye eslê xwe kurdî, lê ev tenê texmîneke ez jê ne bawer im. Weke pîne lê disekine.

Ji bo tengbûna cih ez nikarim hemû notên min girtine bînim ziman, ez ê yên sereke şîrove bikim.

Vegotina wî terzekî ji guhê me re xerîb e û bi xemilandineke awarte hevok saz kirine. *“Destên wê dixwazin bi destê hezkiriyê xwe bigirin, zimanê wê peyvên nêr û têr dixwaze.”* (Bîr Rp.93) Li hevokê binêrin hûn ê bêjin tişteki şênber terfî dike. Lê tenê ev vegotineke razber e û tu hedefa wê nîn e. Tê dîtîn ku îradeyekê dide 'dest' û 'ziman' ji ber ku her du jî daxwazekê dikin. Hema bêjin gelek para-grafên romanê bi vî awayî diherikin. Xema wî lêbarkirina wateyê nîn e. Tiştên ku dixwaze bêje, wan bi rêz dike. Tenê vegotin, ji ruhê xwe, ji dilê xwe; piştî wê ne xem e.

Di vegotina nivîskar de weke qaîdekî cotbare gotin hene ku di dawiya gelek paragrafan de tên dîtîn û nivîskar jê hez dike. Weke mînak; *“... kûr û dûr hatibû û nehatibû, hatibû û nehatibû...”*, *“here û were, here û were, here û vene-gere.”* (Bîr Rp.69), *“Li jêr erdekî tepisî, li jor ezmanekî fetisî, di navberê de du kursî”*. (Spîroj rp. 84), *“Pîrsên bêbersiv û bersivên bê-pîrs”*. (Spîroj. Rp. 106) Bi mijarê re eleqeya wan nîn e, tenê peyv û

hevok in. Pejnek bi mirov re çêdibe ku Nûdem Hezex ketiye dû nêçîra peyv û hevokên biriqî, lê bike jî lê neke jî ew bi cih kirine. Armanç û mebesteke wan nîn e.

Hinek peyv hene ji we tirê kodên nivîskar in ku di her du pirtûkên xwe de jî serî lê dide: cam, şikestek, te, tu, mij, reng, deng, berf, spî, dartû, darî-çav...hwd.

Nûdem Hezex di dawiyê de di rê-witiya xwe ya daborî û pêşerojê de ya li pey Lî û Layê diqedîne û bi xwîneran dide fêmkirin ku Lî û La bav û dayikên 'rêwî' ne. Yanî eLî û ayla ne; Elî û Ayla.

Li gorî min tevî qelsiyên romanê mijara herî serkeftî ev encamanîna dawî ya romana Bîrê ye. Mirov fêhm dike ku rêwîti ji bo çî ye. Di nav mij, nepenî û dîmenên şêlî de encameke konkret-şênber her çiqas li nav terzê wî yê romanê nakok be jî serkeftî ye. Di nav bêwateyiyê de wateya 'darî-çav' e.

Nivîskar goleke peyv, hevok û para-grafên ji xemilandin û edebiyateke biriqî pêk tên lê ew qas jî ne bi wate ne derpêşî me dike ku di nav wan de avjenî kiriye. Xeyal in, xem in, kûrhiş (binhiş) e, derûnî ye, hesret û hêvî ne. Li gorî dil û derûniya xwe çawa guncav dîtiye wisa anîye ziman. Pîvaneke vegotina wî nîn e. Bi rastî ne hêsan e mirov bi her awayî vegotina wî tam bîne ziman. Carinan du para-grafên peyhev bi hev re nakok in an jî ji nişkê ve diçine ser mijarên bêeleqe. Ji nişkê ve jî derdikevin li otobusê siwar dibin, devê bîrekê xuya dibe hwd. Dîsa di nav mija peyvnan de winda dibin.

Û Spîroj: Mijeke ji Bîrê tîrtir. Dîsa rêwîtiyek heye lê xwestiye vê rêwî-tiyê veşerê, nepentir bike, bê têgihîştin bihêle. Dîsa cih bi cih darîçav dibe lê piştî perdeyêke şêlî radixe ser, di bin wê perdeyê de vedibêje gelek reng, deng hene, vegotin heye lê tişte-tek ne xuya ye, şêlî ye. Ji nişkê ve Nazenîn'ek derdikeve pêş, nizanî ji ku hat. Ezê'yek heye bi Tu'yê re hevşa dibe hem jî bi caran, di bin ewran, malan de, li ser kevîran û hwd. Lê di dawiya romanê de Tu û Ezê cara pêşîn hevşa dibin. Ezê dibe Tu, Tu

dibe Ezê û nivîskar bi vê nepeniyê û nezelaliyê romanê bi dawî dike.

“Nêzî salekê ye li çîroka xwe vege-riyame, belkî jî ji çîroka xwe dûr ke-time an jî her du bi hev re... Salek e. Rihê min di bedeneke deh salan ji min mestir de, di bedeneke pîr de ye; çîroka ez bûyî lehengê wê, dinivîsim. Çîroka xwe. Belê, niha serlehengê min e ew kesê heya beriya salekê ez serlehenga wî.”

Romana Spîroj weke ku mirov xewnên tevlihev dibîne; tê de kabûs hene, xweşî hene, kuştin, qeza, cina-wir hene û her tişt ser û bin e. Lê dema tu şiyar dibî ji hêz ketiyî, bê mecal î. Derûniyeke wisa derdixê pêş. Ruh parçe parçe ye. Hûn, camên biray diçin û tên bifikirin. Tam ne yek-pare ne, ji bo ku bîr topkirin parçe parçe ne. Li hev kom bikin û di navbera her yekî de bi qasî du destan li hev siwar bikin û du-sê metre bi paş ve vekişin û lê binêrin. Dîmenê ku derûnî û ruhê romanê tîne derdixê pêş eynî dîtbariya wê camê ye; parçe parçe û li ser hev û ji hev dûr. Îhtimal heye ku bi vê derûniyê xwestiye ji-yana kesayetekî/e hevzayend bişaye-sîne. Ev îhtimal rast be hingê jî lehengê hevzayend takekese/î siyasî 'abê' ye. Ji ber ku di nav mij û mo-ranê de ji yana kesekî siyasî vedibêje.

Vegotina Spîroj'ê gelek dişibe Bîr'ê. Dawiya romana Spîroj'ê berevajî Bîr'ê li gorî terz û teşeyê Nûdem Hezex dixwaze pêşkêş bike, serkeftî ye.

Dawiyê Bîr û Spîroj'ê bi terzên cuda diqedin. Nivîskar xwestiye ku terzê dixwaze bide rûniştandin bi riya van her du roman ragihîne xwîneran. Weke ku di hevpeyvîna xwe de jî gotî, di Spîrojê de ev terzê xwe ser-keftîtir pêk anîye.

Hê ev nivîs nehatibû weşandin lê min ji bo weşanê qedandibû, me çend kesan li ser romanên demên dawî sohbet dikir. Ez bi çav û guhên xwe bûm şahidê vê yekê ku du xwînerên têgihîştî û ji wêjeyê fêhm dikin ji bo terz û naveroka romana Bîr'ê gotin, 'me bi çend caran ceriband lê nebû ku em jê fêhm bikin û me dev ji xwendinê berda'. Hezexî bi terzê xwe xwîner li derveyî romanê digire, ji xwe re nake xem. Nîrxandinên her du

xwîneran, (pêkan e ku bi giranî xwî-ner wiha lê binêrin) der barê roman de fikrêkê derdixê pêş.


Ji derveyî niyet û nîqaşan eger rewş wiha be di qada xwe de jî roman ne serkeftî ne. Divê nivîskar ji xwe re vê yekê bike xem. Eger 'na' be hingê nivîskar ji çî û kê re dinivîse? Divê misoger bersiva vê pîrsê bide.

Terzê Nûdem Hezex surrealîzm e. Kifş e ku Nûdem Hezex li ser roman û terzê surrealîst rawestiyaye û weke terz û teşeyê xwe jî ecibandiye. Di romana Spîroj'ê de ev teşe bi serkeftinî bîriye serî. Lê di romana Bîr'ê de negihîştîyê vê armançê. Ji ber ku pevgi-handina romana Bîr'ê gelek nêzikî romana klasîk kiriye.

Romana surrealîst ji serkaniya psî-kanalîzê ya Freud tê, dizê. Bingeha romanê xwe digihîne kûrhiş (binhiş), ruh, xewn û xeyalên ji kûraya hiş tên. Li gorî psîkanalîzê kûrhiş yek parçe nîn e, tevlihev û gelek kompleks e. Romannûsên surrealîst ev teşe anîne wêjeyê. Terzekî serbest, bêyî ku xema tişteki bikin li gorî çawa(lê)ha-toya xwe nivîsîne. Wê xemê jî nakin xwîner wê çî bibêje û çawa binîrxîne. Kûrhiş, ruh, xewn û xeyal kirine himê teşeyê romanên xwe. Em dikarin bêjin ev terz roman, romana kaos, qeyran, geşî û nexweşiyên kûrhiş, ruh û derûniyê ye.

Lê ev terzê surrealîzm di romanê de serkeftî nebûye û di çavkaniya xwe de yanî di romana Rojava de piştî Şerê Cîhanê yê Pêşî hatiye terikandin. Rexbeta wê kêmhûye, kêmhîvîskaran serî lê daye. Ev terz zêdetir di wê-nexêzî, peykertîraşî, hunerên plastîk ên din û paçeyekî helbestê de hatiye berdewamkirin.

Nivîskar di hevpeyvîna xwe ya Xwebûnê de behsa terzên nû, ji derketina der a teşeyê klasîk dike. Bi rastî ev teşe ji bo Nûdem Hezex û romana kurdî nû ye lê ji bo romana cîhanî kevn e, kadûk e. Divê nivîskarên kurd bi kevnên xelkê yên jîdestder-keftî xwe nû nekin. Dibêjin bi ava destlêketî avdesta cenabetê ne caîz e. Eger caîz bibînin jî divê di nav meydana gund de her kesî pê şiyar nekin, tenê bixwe bi şînor bikin.



Sidar Jîr

"Bihuştê Xezalan" newayeke efsûnî ye

Di çîrokên serdemên dêrîn de, gelek caran bi dengêkî, bi newayeke efsûnî qehreman derbasî cîhanê efsûnî dibe. Di serî de sawek li ser e, bi gavên sist diçe û paşê wekî xwezaya li ser dimeşe nas kiribe bawerî têyê. Dide pey deng û dest bi rêwîtiyekê dike. Di wê rêwîtiyê de, pêrgî gelek tiştan tê û hêdî hêdî dar û ber û tiştên derdikevin pêşberî wan bi bîr tînin û nas dikin. Dema baş pê bawer dibe ku wan tiştên dîtiye di cîhana dîtir de nas dike, êdî bi kêf li pey wê newaya efsûnî baz dide. Wê demê deng ne tenê di guh de ye êdî... Hemû ruh radipêçe.

Romana bi navê BIHUŞTA XEZALAN a Eyşana Beravî jî bi wê newaya efsûnî mirov ber bi xwe ve dikişîne û heta dawiya romanê ew sewt nahêle tu dev jê berdî. Efsûna di romanê de bi xezalekê dest pê dike û ber bi bihuşteke nas ve diçe. Rastî û xeyal anku efsûn her mîna paradoksekê bi hev re hatiye honandin. Mîr Xalid Beg, hêz e, desthilatî ye... Di gelek cîhan de aqil e, zanîn e û heta radeyekê hukmê xwezaniyê ye. Pîresêr (pîra sêr) li dilovanî û tirs e. Mîrxeyal, jina ku dikeve dirûvê heyvê, rastiya û nistiya di mista Hesenê Gavan de çîrokên di nav çîrokê de ne. Metneke parçe-kirî bi çîrokên rastî û xeyalî bi hev ve hatine kelijandin. Bi kelijandina çîrokên di nav romanê de, xwendevên ber bi zarokatiyeke dûr ve dibe. Di navbera hebûn û tunebûnê de çûn û hatinek 'efsûnî' xwendevan çalak di hêle.

Roman wekî rêwîtiyeke ber bi zema-nekî ne diyar ve di nav mista Hesenê Gavan de, berê mirov dide newaleke antîk û bideng û sewteke nişmî heyv û xezal dibin hevrêyên xwendevên.

Bi her newaya ku ji Bihuştê Xezalan ber bi dil û mejiyê mirov de olan dide, hesta ku evîn û şadî ji jiyana rastî dûr e li aliyê xeyalî jî hestiyên evîn û evîndaran li ser hev bûne lod. Bi vegotineke gelêrî, evînen şikestî di rûyê heyveke çardehşevî de wekî derzekê xwe dide der.

Di romanê de du ferhengên para-doksî hene. Wekî rastî û xeyalî, wekî qencî û hêrsê, evîn û îxanet, duristî û xapandin... Lê derê her du ferhengan jî di heman demê de li ber vebêjer heta dawiyê vekirî ne û bi hev re teşeyê didin BIHUŞTA XEZALAN.

Heta dawiya romanê, Eyşana Beravî rê nedaye xwendevên ku xwe ji nav wê jiyana çûn û hatin zêde ye derxe. Her ku diçe ber bi newayek, ber bi olanek dîtir ve dibe. Lê di taliyê de çîrokên di nav hev de wekî orkestrayekê bi hev re olan didin, ji mista Hesen ber şeveke rastîn û tarî ve baz didin.

Piştî em bi tîp û karakterên romanê re li ber bayê xezalekê li ba dibin, em hîn dibin ku gavanek ji mîrekî wêdetir bûye behsa qîseyê. Mîr Xalid hewl dide bika-ribe serî bi Hesenîkê Gavan re derxe. Di dawiya dawî de, Hesenîk heyfa xwe ji hemû vebêj û çîrokan hiltîne.

Di encama pirtûkê de, wekî mirov di xewê de bicemide û xewneke tîrsnak şiyar bibe, em pê dihesin ku hemû çîrok di pirtûka mista Hesen de hatine nivîsin... Her kes çîroka xwe vedibêje lê Hesenîk hemû çîrokan ji bihuştê diqewitîne û li wê derê, nivîskar pênuş û hizrê êdî radestî xwendevan dike da ku ew çîrokên xwe bi xeyal û rîtmeke efsûnî bidomînin...

BIHUŞTA XEZALAN, Eyşana BERAÎ, 127 rp, Weşanên Lîs, 2021



Êrîşên Dîfa El-Wetenî

Hêzên nîvfermî yên girêdayî rejîma Şamê Dîfaa El-Wetenî, şeva 21’ê nîsanê bi çekên giran êrîşî Hêzên Ewlekariya Hundirîn ên Qamişloyê kir û di encama êrîşê de şer derket

|| Navenda Nûçeyan

Li Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê ji aliyekî ve êrîşên Tirkîyeyê li ser Eyn Îsa û Şeh-bayê, ji aliyê din ve jî êrîşên rejîmê li Qamişloyê didomin. Rejîma Sûriyeyê bi hêzên xwe yên taybet dixwaze Rêvebe-riya Xweser têk bibe. Hêza bi navê Dîfaa El-Wetenî ya ku ji 12’ê adara 2004’an ve rejîmê wê li dijî kurdan bi kar tîne, careke din xiste dewrê.

Hêza girêdayî rejîmê Dîfaa El-We-tenî ku di sala 2004’an de li dijî kurdan hatibû birêxistinkirin, ji wê salê ve êrîşî kurdan dike.

Dîfaa El-Wetenî herî dawî di meha si-bata 2021’ê de li bajarê Hesekê êrîşî hêzên asayîşa Rêvebiriya Xweser kiribûn.

Êrîşî sivîlan dikin

Di şeva 21’ê nîsanê de, li bajarê Qa-mişlo milîsên Dîfaa El-Wetenî êrîşî Hêzên Ewlekariya Hundirîn kirin û di encama êrîşê de şer derket. Di pevçûnên li der-dora taxa Tey a bajar qewîmin de, Hêzên Ewlekariya Hundirîn benda kontrolê ya diçe taxa Tey ku komên Dîfaa El-Wetenî ji wir êrîş dabûn destpêkirin, kontrol kirin. Di pevçûnan de endamekî Hêzên Ewlekariya Hundirîn û zarokê bi navê Mehmûd Mehmûd (10) jiyana xwe ji dest dan û zarok jî di nav de gelek sivîl birîndar bûn.

Daxuyaniya hêzên ewlekariyê

Navenda Ragihandinê ya Hêzên Ew-lekariya Hundirîn a Bakur û Rohhilatê Sû-riyeyê, têkildarî êrîş û şerê li Qamişloyê daxuyanî da. Navendê di daxuyaniya xwe de diyar kir ku Dîfa El-Wetenî kiryarên xwe yên bi armanca têkbirina ewlehî û aramiya li bajarê Qamişloyê didomîne û wiha got: “Em weke Hêzên Ewlekariya Hundirîn ji bo parastina xwe û têkbirina tevahî hewldanên milîsan ên hedefgir-tina nuqteyên me yên ewlehiyê, derxis-tina fitneyê û afirandina rewêşeke nearam, ji bo şênîyên herêmê yek kêliyê dudil nabin. Em teqez dikin ku em ê bi tundî bersiva van kiryarên bidin.”

Şandeya Rûsya û Şamê

Piştî ku Dîfa El-Wetenî peyman binpê kir şandeyek ji Rûsya û hikûmeta Şamê, bi fermanدارên Hêzên Ewlekariya Hundirîn re civiyan. Şandeyê rewşa agir-besta ku milîsên Dîfaa El-Wetenî binpê kiriye, şopand. Tevî ku hewldanên Rûsya û hikûmeta Şamê jî, siyasetmedarên Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê diyar dikin ku milîsên Dîfaa El-Wetenî bêyî erêkirina her du alî nikarin tişteki bikin.

Armanca êrîşan tevlihevî ye

Der barê êrîşên çeteyên Dîfaa El-Wetenî yên li Qamişloyê de, hevse-roka Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê Bêrîvan Xalid axivî û got ku armanca van êrîşan di navbera kurd û ereban de derxistina nakikoyan e.

‘Em rê nadin binpêkirinan’

Bêrîvan Xalid bi bîr xist ku ev êrîş ne cara yekemîn pêk tên û ev tişt anî ziman: “Dem bi dem hikûmeta Şamê bi rêya van milîsan dixwaze ewlehiya he-rêmê û deskeftiyên Rêveberiya Xweser têk bibe. Em ê rê nedin tu kesî ku ew-lehî û deskeftiyên herêmê binpê bikin û em ê şênîyên herêmê biparêzin. Wê sî-norek ji wan re bê danîn û bersiva wan bê dayîn. Hewldanên wan hene ku fit-neyê bixin nav kurd û ereban.”

Hevseroka Meclisa Rêveber a Rê-veberiya Xweser a Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê Bêrîvan Xalid têkildarî hedef-girtina sivîlan ji aliyê çeteyên Dîfaa El-



Wetenî ve jî ev tişt anî ziman: “Mixa-bin êrîşên van çeteyan xetereyekê li ser jiyana sivîlan jî çêdikin. Hewldanên hêzên me hene ku sivîlan ji wir derxin û wan biparêzin.”

Dîfaa El-Wetenî kî ye?

Destpêka Dîfaa El Wetenî dema hêzên hikûmeta Şamê li dijî gelê kurd operasyonên girtinê pêk dinanîn, komên şovenist ên navê “Dîfa Wetanî” li xwe dikin, li sûkên navendî bi taybetî yên Qa-mişlo û Hesekê, deriyê dikanan dişikan-din û wan talan dikirin. Ev yek bi dîmenan û wêneyan hatin belgekirin. Bi destpêka aloziya Sûriyeyê re ku hikû-meta Şamê li xwepêşandêran tundî dikir, komên navborî “Dîfaa El-Wetenî” car din derketin pêş. Hikûmeta Şamê bi gurbûna şerê li dijî komên çekdar, di 2012’an de li bajarê Humisê komên milî-san ava kirin û sazûmaniya van milîsan li deverên cuda yên Sûriyeyê belav kir.

Hêza nîvfermî

Hêza “Dîfaa El Wetenî” di sala 2013’an de bû hêzeke nîvfermî. Nemaze piştî hikûmeta Şamê desteka madî da wan, milîsên Dîfaa El-Wetenî erkên rê-veberî, fermanدارî û navendên perwer-deyê girtin. Her wiha bûn xwedî mohreke fermî, şîar, al û bi kincên yek-bûyî tevdigerin û mûçeyan digirin.

Hêjayî gotinê ye ku çeteyên Dîfaa El-Wetenî li herêmê gelek sûcên wekî revandina şênîyan, dizî, firotina made-yên hişbir û derxistina tevliheviyê kirine.



Li Eyn Îsayê sivîl tên hedefgirtin

Dewleta tirk û komên girêdayî wê, di êrîşên li ser navçeya Eyn Îsa û gunde-warên wê de sivîlan dikin hedef. Herî dawî gundê Hoşan ku dikeve rojavayê navçeya Eyn Îsa û li ser rêya M4’ê, bi dijarî topbaran kirin.

Di topbarana li ser gundê Hoşan de gelek mal û avahiyên sivîlan rûxi-yan. Piştî berxwedana 3 rojan ku gel û şervanan li Eyn Îsayê di 19’ê adarê de

li hemberî artêşa tirk nîşan da û êrîşên wan têk birin, artêşa tirk û komên gi-rêdayî wê êrîşên xwe yên navçeyê dij-wartir kirin.

Ev demek dirêj e, navçeya Eyn Îsa û gundewarên wê dibin armanca êrî-şên dagirkeriyê. Hêjayî gotinê ye ku di van êrîşên dawî de çekên qedexekirî tên bikaranîn û bi van çekan welatiyên herêmê tên hedefgirtin. **EYN ÎSA**

Nûnerê DYA'yê bi Nûnerên Rêveberiya Xweser re civiya

Hefteya borî cîgirê nûnerê serokatîyê yê DYA’yê David Brownstein, bi şandeya ji Rêveberiya Xweser a Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê ya bi serkêşiya Hevserokatiya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê Ebid Hamid El-Mihbaş û Bêrîvan Xalid re civiya. Cîvîn li bajarê Hesekê pêk hat.

Her du alîyan li ser gelek dosyayên stratejîk ên girêdayî herêmê axivîn. Yek ji mijarên ku axi-vîn plana Rêveberiya Xwe-ser a der barê pêseroja herêman çawaniya dabînkirina xwetêrkirinê de ji ber-hemên çandiniyê bû. Her wiha li ser berdegama piş-tevaniya DYA’yê, ji Rêvebe-riya Xweser re di aliyê xizmetguzarî, aborî û ewle-

hiyê de nîqaş hatin kirin.

Her wiha her du alîyan bi awayekî berfireh behsa bandora neyînî ya pan-demîya vîrûsa koronayê li Bakur û Rohi-latê Sûriyeyê û çawaniya xweparastinê kir. Her wiha hat destnîşankirin ku heta niha tu derman li dijî vê nexweşiyê ji bo herêmên Bakur û Rohhilatê Sûriyeyê re nehatine şandin. **HESEKÊ**



Xweşkanî

Felemez Ulug



Tirkiye û bazara çekan

Di qada navneteweyî de, li parzemî-nên cuda bûyerên diqewimin bi hev ve girêdayî ne. Nakokiyên di navbera Rûsya û Ûkraynayê de û derxistina Tirkîyeyê ji projeya balafirên şer ên F-35 wek du mînakên van pêşveçûnan in ku derdikevin pêş.

Di van salên dawî de, dewleta tirk bi polîtîkayên xwe yên şerxwaz ve bala gelek dewletên ên di pişesaziya çekan de bi pêş ketine dikişîne ser xwe. Bêguman ji van dewletan bazara herî baş li wan welatan in ku şerê germ li wan tê jiyan û li ser vî şerî desthilatdar xwe li ser piyan digirin.

Ji ber di roja me ya îroyîn de, dest-hilatdariya AKP-MHP’ê bi mîlîtarîzmê xwe li ser piyan digire pêdiviya wê bi vê bazara çekan heye.

Lewma desthilatdariya Tirkîyeyê di qada navneteweyî de bi qasî ku di projeyên çekan de cih digire di proje-

yên avhewa, ekolojî, çand û bipêşxis-tina mafên mirovan de nagire.

Yek ji van projeyên ku xewn û xeyalên desthilatdariya AKP-MHP’ê dixemilî ne jî projeya balafirên şer ên F-35 bû. Lê ji ber çavsooriya dew-leta tirk ku dixwest di projeyên nav-neteweyî de cih bigire ev xeyala wê jî têk çû.

Wezareta Parastina Dewletên Yekbûyî yên Amarîkayê, diyar kir ku wan ji rêvebiriya Enqereyê re ragi-handiye ku bi fermî Tirkiye ji projeya F-35 derxistiye.

Bêguman ev projeya ku bi tevî-bûna Amarîka, Bîrtanya, Îtalya, Hol-landa, Avûstralya, Danîmarka, Kanada û Norveçê pêk dihat, ji bo dewleta tirk gelek tişt îfade dikir.

Dewleta tirk ji bo ji vê projeyê neyê dûrxistin di qada navneteweyî de kar kir. Lê wisa diyar e ku kesên ew

ji vê projeyê derxistiye li ser hin mija-ran ne îqna ne. Ew jî mijara ku xirabi-yên Tirkîyeyê ji başiyên wê zêdetir in.

Bi taybetî ev nakokî piştî dewleta tirk ji Rûsyayê fûzeyên S-400 kirî û şûn ve zêdetir hat rojevê. Di halê heyî de fûzeyên ku hatine kirîn jî hîn wek tên xwestin nehatine aktîfkirin. Jixwe li dijî kê û çima bên aktîfkirin jî yek ji-mijarên sereke yên li pişt perdeyê ne ku tên axaftin. Lê mijara me ne ew e.

Desthilatdariya AKP-MHP’ê her çendî dibêje “ji derketina vê porjeyê ne xema me ye” rastî ne wisa ye. Ji derketina vê projeyê di qada navnete-weyî de wê hin pêkanînen din jî bi xwe re bîne. Rêveberiya Enqereyê jî bi vê dizane. Lewma ji bo ev pêkanîn li ser wan zerarek mezin nedin avakirin di nav hewildanan de ne.

Beriya biryara Amarîka û Kana-dayê ku bi salan e teknolojiya çekê di-

firot dewleta tirk, bi hinceta ku li Qe-rebaxê ew çek bi kar aniye, firotina çekan a ji bo Tirkîyeyê betal kir. Piştî wê kêma be jî di qada navneteweyî de jî sînyalên bi vî rengî hatin dayîn.

Bi vê biryara ji derxistina projeya balafirên şer ên F-35 û şûn ve, wê li ser dewleta tirk pêkanînen çawa bên meşandin hîn ne diyar e. Rêveberiya Enqereyê ji bo ji vê rewşê zêde ban-dor nebe berê xwe daye bazara Kaf-kasyayê. Lewma hewil didin ku krîza di navbera Rûsya û Ûkraynayê de kûr bikin.

Jixwe ji despêkê ve dewleta tirk xwe wek alîgirê Ûkraynayê da nîşan-dan û di vê mijarê de her dem dijber-tiya Rûsyayê kir. Lê ji bo dilê Rûsyayê jî xweş bike hemû daxwazên Rûsyayê jî qebûl kir. Yanî li gor xwe di nav siya-seta dualî de bû. Lê ev siyaseta peritî îro Tirkiye xistiye rewêşe pir nebaş.

Piştî diyar bû ku wê dewleta tirk balafirên keşfê yên bêmîrov bifroşe Ûkraynayê, Rûsya kêma be jî rengê xwe diyar kir. Çend roj ber li ser vê mijarê serokdewletê Rûsyayê Vlade-mîr Pûtîn axifî û bi van gotinan bal ki-şand ser girîngiya mijarê; “Em têra xwe bi sebir in, lê bersiva me ya li dijî provakasyonan wê tund be.” Gotinên Pûtîn bi vê ve ne sînordar bûn. Pûtîn ji bo welatên ku bi Rûsyayê re di nav te-kîliyê de ne jî ev hişyarî kir; “Ez hêvî dikim ku tu welat di têkiliyên xwe yên bi Rûsyayê re xetên sor derbas neke.”

Pûtîn bi vê nîrxandina xwe ne tenê dewleta tirk hêzên ku dixwazin krîza Ûkraynayê li dijî Rûsyayê bi kar bînin jî tehdît kir. Lê di vê mijarê de ya herî binketî dewleta tirk e. Ji ber ku dewleta tirk bi polîtîkayên xwe yên şaş û ferzkirî hem ji dêrê bû him jî ji mizgeftê.



Destar

Ehmed Pelda

Aboriya rêxistinkirî ya li dijî monopolan

Li gorî marksîzmê, divê milkiyet rabe. Her tişt bibe malê dewletê. Lê belê tecrûbeyên dîrokî nîşan dan ku ev çewt e. Dewlet bixwe wek monopolê dibe xwedî milkiyeta herî mezin. Bi riya burokratên xwe jî ji yên kapîtalîst xerabtir zordestiyê dike.

Nav, reng û rûçikê pergalê çi dibe bila bibe ji berê ve heyanî niha hatiye dftin ku xeletiya herî mezin desteseriya milkiyetê ya monopolan e. Milkiyeta qesta me lê ye, tenê xwedîtîya erdê nîn e. Patent û destûrname/ruhsat, qanunên bêtesîr û bi navê parastina reqabetê riya monopolan vedikin jî di nav çarçoveya dahûrandinê de ye. A niha dermanê Covid-19'ê ji ber patentê tenê di dest çend şîrketan de ye û rê nadin ku hilberîna wê bi destê hin saziyên din pêk bê û mirovahî ji vê belayê rizgar bibe. Wekî vê hemû şîrketên teknolojiyê bi vê rêyê sermaye û hêza xwe diparêzin.

Li hemberî monopol ango bi qewlê gotina kurdî hûtên aboriyê, gelo divê helwesteke çawa hebe? Destdanîna li ser nabe encax bi destê dewletê pêkane ye û ku ew jî monopolalek e. Lê şert û mercên guncav ew in ku rêxistina civakê di vê der barê de hebe. Çawa gêrik gava ya xwe bikin yek zora filan dibin yek, rêxistina civakî jî ji bo vê girîng e.

Saziyên sivil ên berxwarinê, saziyên esnaf, dikandar, marangoz û bazirganên xwedî hêza, keda xwe an jî yên navîn divê rêxistinên xwe xurt bikin. Bi rêya kooperatîfan, yekitiyên sermayeya hevpar, hevgirtinên kirîn û firo-

tana hewcedariyan, kelûpelan û berhe-man bèn sazkin.

Xebatkârên xwedî pişê yên wek bi-jîşk, parêzger, endezyar, muhasebe, şêwirmendê karsazî û diravî, rêxistina xwe ya pişeyî ji nû ve bihûnin. Yekitiyên wek kargeh û karxaneyên hevpar û xweser saz bikin. Wek nimûne, bijîşkê her bajarî dikarin bi hev re nexweşxaneyan saz bikin. Wexta ew karê bijîşkî dikin, muhasebe û aborîzan jî dikarin hesabgirî, rêveberî û rêxistina wê saz bikin. Hemû karker pişekar, xebatkar wek meclis biryaran bidin û beşdar bibin. Ev dikarin di asta welêt de bi awayekî konfederalî tev bixebitin. Amûr û alavan bi hev re peyda bikin. Standart û pîvanan saz bikin, tecrûbe û zanînan parve bikin, destekariya pişeyî bidin hev. Ev hêz hem dikare hûtên monopol zêdetir kar bikin û hem jî zordestiya wan asteng bikin.

Unîversîteyên îroyîn ji civakê qetiyane û ji bo destekariya aborî li gor daxwaza şîrket, monopol û dewletan dixebitin. Dîsa rasterast bi destê monopolan hatine avakirin. Lê belê xwedan pişeyên di nav jiyanê de kar û xebatan dikin, dikarin sazî û unîversîteyên xwe ava bikin an jî bibin endamên unîversîteyên heyî, wek mamoste, şêwirmend, zanînan û ezmûnên xwe parve bikin. Dîsa xwendekar bikaribin di kargehên van saziyên sivil de ezmûnan bikin, destekariyê bidin û pişeya xwe jî bi pêş bixin.

Yekitiya rênçber û cotkaran gelekî girîng e. Bi rêya kooperatîfan, an jî wek saziyên sivil dikarin hemû karê xwe jî bikin yek an jî ji bo hin karan bibin hev-

kar. Wekî bi hevkarî kirîna tov, gubre û alavan pêkan e. Dîsa dikarin bihayê xwe, mercên xwe li piyaseyê bidin qebûlkirin û xwe li hemberî hûtan, spekulatoran biparêzin. Her weha dema firotinê jî dikarin standartên kalîteya berhema, bihayê wê baş bikin.

Li dewsa bankayên bazirganiya pereyan dikin, divê kooperatîf banka an jî kompereyên gel hebin ku ji bo destekariya projeyan bixebitin û perê wê jî bi destê beşdarên kedkaran bê peydakirin. Li dewsa patentên hûtan, bankaya patentan ji gel re vekirî hebin ku kî bixwaze karekî bike ji patentan bi serbestî sûd werbigire. Li dewsa standartkirina ziman, ders û lêkolînên unîversîteyên di bin xizmeta hûtan de ne fêrgehên serbest divê hebin ku modêla wek wîkîpediyê û bêhtir mînak hene.

Kargehên xweser an jî piğariya xe-

batkaran ku sektorên wek petrol, enerjî, bendav, rêya erebe, rêya hesinî yan hewayî xwe bixebitînin. Sermayeya van giran e û xebateke navendî pêwîst e. Bacgir heke dewlet be yan jî rêveberiyê herêmî be, dikare pareke sermayeyê ji bo van karan veqetîne. Hewce be karsaziyên civakî ne yên takekes jî bibin hevpar. Ev kargehên ku bèn avakirin divê xweser bin. Karê wan jî bi destê xebatkaran bimeşe. Hiskî karker be, hiskî xwedanpişe be ku wekî endezyar, aborîzan, karsaz hwd divê meclisên xwe ava bikin. Li gorî pêdiviyên di hin periyodan de civînan pêk bînin. Biryaran bidin, kontrolê bikin, rêveberiyê bijbêrin, karkeran bigirin, an jî ji kar dûr bixin. Karên teknik û finansî aşkera bikin û biryaran bidin... wê rêveberiya xwe jî xwe bi xwe bimeşînin.

Ev sazî bi sermayeya xwe nehatine

sazkin. Lê karê ku dikin stratejîk e. Hem ji bo pêşketina aborî, him jî ji bo destfirehî û xêrxweşiya civakê kar dikin. Pozîsyona wan bi awayekî di rewşa monopol de ye. Lewma qezenca wan jî standart e û garantî ye. Li gorî vê lazim e standartê jiyanê karkeran misoger bike û beşa qezencê ya mayî bide budçeya navendî ji bo karûbarên din bê şuxulandin an jî kompereyên destekariya projeyan dikin. Li dewsa meaşekî standart wekî kapîtalîzmê divê meaşê li gorî pêdiviyên hebe. Kesê destkar dike divê aşkera bike ku çiqas lêçûna wî heye. Li gorî wê meaşek bê dayîn. Pirs-girekên wî kêma zêde bibin, divê meaşê wî jî li gorî wê biguhere. Mesela heke kirê dide, heke sexbêriya gelek şênîyên malê dike, li malê xebatkar kêma bin, zarok zêde bin û xumamiya wan lazim be.



Bijî 1'ê Gulanê


Em hêvî dikin 1'ê Gulanê Roja Karkeran a Cîhanê rojên xweş û azad, wekhevî û keda azad û bi rûmet, karker û kedkaran re bîne. Bi van hest û hêviyan, em roja 1'ê Gulanê li hemû kedkar û karkerên cîhanê û bi taybetî li kedkarên welatê xwe pîroz dikin.



DISK | KESK | TMMOB | TTB

Odeya Bazirganî û Pişesaziyê ya Amedê

Destana neteweyekê: Ferx û Gilgamêş



Kenan Colemêrgi

Mirov, an jî weke pênaseya mirovan homo sapiens, bi qasî ku xwe nas kirî li pey xwesteka naskirina xwe ketiye. Bi mejiyê xwe, bi serpêhatiyên xwe her xwestiye xwe ji zîndewerên din cuda bike. Her xwestiye xwe vebêje.

4,5 milyar sal beriya niha cihan ava bû û di vê navbeynê de gelek formên jiyane pêk hatin û digel vê jî gelek formên jiyane jî qediyar. Di nav van hemû forman de, yek jê forma mirovahiyê ye helbet. Forma mirovahiyê herî zêde 4 milyon sal in heye hinek ji van forman milyar sal in hene. Lê belê yek form jî weke mirovan (homo sapiens) nekir, di nav demeke kurt de li dûv têgeha cihanê neket.

Çi bû ku homo sapiens xwe ji van forman cuda kir?

Mirov, piştî hay ji zanîna xwe çêbû, her xwest xwe ji bilî hemû zîndewerên din bibîne û bihesibîne û dem hat, mirovahiyê pîrsa ‘ez kî me?’ yê li xwe kir. Piştî vê pîrsê hêdî hêdî ji xwe û ji xwezayê dûr ket. Homo sapiens hingê xwe nêzîkî jiyana asîmanan kir; jiyana nediyariyê, bêdawîtiyê...

Ev xwesteka zanînê û pîrsînê kir ku mirov teknîkê ava bike. Ji bo bersivandina van pîrsan teknîk hewce bû. Teknîk bi peydakirina amûran û helbet bi peydakirina zimanê zêdetir pêşket. Ziman jî kir ku mirov xwe he bike, hebûna xwe di nav cihanê de, di nav giyanewerên kovî de qahîm bike. Teqîben ji 200 hezar sal berê heta niha bi vî amûrê (ziman) mirov, pîrsa xwe dike û dibêje ‘ez kî me, jiyana çî ye, mirin ji bo çî ye, ez dê bi ku ve biçim?’ Bi van pîrsan mirovahî jî xwe re çîrok, serpêhatî û destan ava kirin û mîtos çêkirin ku bikaribe digel veguhasîtinê van pîrsan jî bibersivîne.

Gelek şaristaniyan piştî demekê, ji xwe re nivîs dahênanandin, mîtos û çîrokên xwe bi vî dahênanê remz û sembol kirin. Bi nivîsê yan ku bi çanda nivîsê, çîrok û mîtosên van şaristaniyan bi sembolên hingê, bi sembolên wê demê hatine nivîsandin û wisa man. Heke bi awayekî din bibêjin, çîrokên wan şaristaniyan herî zêde heta pênc sedsalan jiyana, paşê fetisîn û wateyên sembolên xwe wenda kirin. Mirovên pispor her xwestin û bi vî mijûl bûn ku van sembolan rawe bikin, li gorî dema xwe nivîsên pênc hezar sal beriya niha şîrove bikin, lê bînin. Ev digel xwe pîrsgirêka wateyan anî, wateya peyveke gelek resen li gorî pênc hezar sal beriya niha giran be, niha wateya wê peyvê êdî sivik dihat.

Lê belê ziman an ku çanda devkî wiha nebû. Bêsekn her peyvek zindî



ma, çîrokên hezar salan bi zimanî heta roja îroyîn bi awayekî zindî veguhast. Ew mîtos û çîrokên bi zimên hatine sembolkirin û hatine veguhastin, li gorî demsal, sal, sedsal û hezarsalên xwe lê hatin û bi tişteke zindî (mîrov) her hatin veguhastin.

Lêgerîna wateyan

Ji bilî mirovan hemû giyanewer nizanin ku dê rojek bê, jiyana wan dê dawî bibe û bimirin. Ji ber hindê ye ku mirov her xwestiye têbigehe, her xwestiye wateyekê ji vî dûmahîkê re peyda bike. Ev rewşe bi xwe re bêgavitiyê (bêçaretî) tîne, ji bo vî bêgavîtiyê tenê mirov xwestiye çareseriyekê kifş bike û ji ber vî yêkê ber bi rêkên bêçaretiyê bûye rêwî. Her çî kiribe jî rastî mirinê hatiye, digel mirinê jiyana xwe jî nas kiriye. Di vî lêgerîna wateyan de, ku pêşiya mirinê jiyana xwe xweş û hêsan bike tiştin ava kirine; ziman, nivîs, veguhastin hwd.

Digel van ji xwe re mîtosên wateyan, çîrokên wateyên serpêhatiyên xwe ava kiriye. Tiştin zanîne û hay ji vî zanîna xwe çêbûye, bi kurtasî mirov zaniye ku êdî dizane...

Belê zaniye ku dê bimire, dawîyeke wê/wî heye. Digel vî jiyana xwe nas kiriye. Paşê ji xwe re bi zanîna mirinê, tişteke mezintir û berfirehtir ava kiriye; "Belê dê bimirin lê belê piştî wê mirinê jiyaneke din heye, ew jiyana bêdawî ye, abadînî ye." Ev hevok metafora nivîsa me ye; "Heke bixwazî nemir bî, divê bimirî!"

Şaristaniyan bi nivîsê zanîna xwe veguhastin, gelo kurdan çî kir?

Somerî, akadî û gelek şaristaniyên din ên cihanê bi nivîsan serpêhatî, zanîn û mîtosên xwe heta roja îroyîn veguhastin. Hê niha jî ew nivîsên 2-3 hezar sal beriya niha weke wê rojê dixwinîn, çî hatibe nivîsandin wê dixwinîn. Lê belê hê jî gelek caran sembolên peyvên wan wextan di nav xwe de dinirxînin, dibêjin; gelo dema "asîman"

hatî nivîsîn kesê nivîskar xwest çî bibêje, bi kîjan wateyê bi kar anî? Û bi vî awayî em di dema îroyîn de li gorî xwe peyv û sembolên 3 hezar sal beriya niha dinirxînin.

Bîr wiha nîne. Bîr çîrok û mîtosên 3 hezar sal beriya niha jî her li gorî dema xwe bi lêv kiriye, 3 hezar sal beriya niha mîtosek çawa hatibe gotin bi awayekî zindî an ku bi awayê mirov û zimên, kêman caran di bin bandora civakan de guhertiye û heta dema îro aniye. Kurd, xwedan/xweyî bîr in. Xwedaniya bîra xwe bi dengbêjan kirine û her zindî hêlandine.

Her çawa şaristaniyan xwedaniya bîra xwe bi sembolên demî an ku bi nivîsê kiribin, kurdan jî bi bîra dengbêjan ve ev xwedanî kirin û heta îroyîn anîn.

Niha, gelek lêkolîn û dahûrandinên mîtolojîk ji hêla pisporan ve li ser van nivîsên tabletan tên kirin. Lê belê heta niha min nedît û nebihîst ku ka çî dahûrandin li ser bend û peyvên dengbêjan hatine kirin.

Ji ber vî yekê min di nivîsa "Destana Neteweyekê" de xwest nivîsên tablet û destanên şaristaniyan digel destanê ku ji bîra dengbêjan dirije berawird bikim.

Hevşîbînek mîtolojîk a bêhempa di nav destanên me û van destanên nivîskî yên şaristaniyên kevn de hene. Di nivîsa din de bi qasî ku ji min hat, min hevşîbînen destanên cihanê yên nivîskî û destana Ferx û Sîtiyê kir. Dixwazim bi vî nivîsê û beşeke din a vî nivîsê, hevşîbînen Gilgamêş û Ferx û Sîtiyê bikim û vî rêzenivîsê bi encam bikim.

Divêt ewilî em vî pîrsê bikin Çima Gilgamîş, çima Ferx û Sîtî? Heke bi kurtasî her du destanan hevşîbînin, ew jî hevşêweya destpêk, herikîn û lêgerîna wateya van her du destanan e.

Bavê Gilgamîşî mîrê bajarê Urukê ye, nîvxwedawend e, helbet Gilgamîş jî nîvxwedayî ye. Her çend nivê wî xweda be jî nivê din mirov e û destan ji ser trajediya nîvmiroviya Gilgamîşî diherike û dikeve lêgerînekê.

Bavê Ferxî jî mîrê bajarê Xumaroyê ye. Xuya ye ku bi bandora olan çîrok guheriye, qala xwedayetiya dayik û bavê Ferxî nayê kirin lê belê tişteke heye ku hêj neguheriye; ew jî bi saya sêvekê ji dayikbûna Ferx û Sîtiyê ye.

Ferx, hê jî bi awayekî nerm di destanê de nîvxwedayetiya xwe parastiye; "Ferx, dema ji dayik dibe, digel derdorên xwe diaxive û nifinînan/nifiran dike û ev nifir di demê de pêk tên."

Ev vî nîşanê me dide, her çend di bin bandora olan de mabe û hin cih guherîbin jî, hê jî helwesta nasandina kesayeta sereke Ferx, ji xwe tişteke wenda nekirîye.



Gilgamîşî fêhleke xirab heye di destanê de

Wek nîvxwedayî di welatê xwe de her çend jin hebin dixwaze ev jin hemû bi wî re bin û xortên welatê xwe dike kole.

Piştî demekê mirovên wî welatî, ji xwedawendan dixwazin ev serdestî biqede. Xwedawendên cihî, ji bo ku Gilgamîşî hay ji xwe bînin, Enkidu dişînin li ser rûyê erdê. Gilgamîş di heman demê de, xewnekê dibîne û vî xewnê ji dayika xwe re dibêje, dayika Gilgamîşî jê re dibêje; "Ev xeberek pîroz e, xwedayên me ji te re yar û yarmetek dişînin."

Enkiduyê ku bi xwedayî û kovî hatî li ser rûyê erdê, ji hêla jineke ji hêla Gilgamîşî ve hatî şandin, di nav çend rojan de diguhere û dibe weke mirovan. Fêhlên mirovan digire û Enkiduyê weke ajalek kovî êdî cilan li xwe dike, bêhnani li ser xwe diwerîne. Ew jî êdî dibe nîvmîrov û ji xwezaya xwe dûr dikeve, êdî dibe xwedî mirin.

Enkidu, ji wê daristanê êdî weke nîvxweda û nîvmîrov derdikeve. Rêka wî ber bi bajarê Gilgamîşî dikeve, dibîne ku hengameyek pêk hatiye, dixwaze bizane ka ji çî ye û dipirse. Jê re dibêjin "Gilgamîş careke din dixwaze bikeve di nav cihên canejinekê" hêrs dibe û tê bîra wî ku ew (Enkidu) ji ber vî yekê ji hêla xwedayan ve hatibû şandin û xwe li Gilgamîşî dide, şerek mezin dikan. Her du alî her çend hewl bidin ji nikarine hevûdu, kesek ji vî şerî bi ser na-keve. Her du ji nişka ve li hember hevûdu ji dil tişteke hîs dikan û şerî disekinînin. (Her şîrovekarek li vî derê cuda şîrove dike, hinek dibêjin, dildarên hevûdu bûn, hinek dibêjin hîsa biratiyê kirin hwd. Weke li jorê min got; "nivîs an ku çanda nivîskî li gorî demê digel xwe şîroveyên cur bi cur tîne lê belê çanda devkî wiha nîne, ew her wekî xwe ye ji bilî guhertinê biçûk dest li bêrên çanda devkî na-keve)

Ferxî jî fêhleke xirab heye

Dema ji dayika xwe dibe pêre dest bi nifiran dike û nifirên Ferxî di cih de pêk tên. Ferx jî weke Gilgamîşî taybetiyên xwedawendiya xwe bi awayekî xirab bi kar tîne. Tenê tişteke

heye ku weke Enkidu Ferxî rawestîne, ew jî ‘yar û yarmetek e’. Li vî derê yar û yarmet Sîtî ye. Digel Ferxî, Sîtî jî ji dayik dibe. Weke em dizanin Ferx û Sîtî, piştî dayik û bavên wan sêva eşqê dixwin, her du ji nivîs sêvekê çêdibin an ku Sîtî û Ferx weke nivîs sêvekê hatine li ser dinyayê, parçeyek Ferx e, perçeya din Sîtî ye.

Bi herikîna çîrokê re em dizanin ku Sîtî ji bo tepisandin û hevêşana fêhlên xirab ên Ferx hatiye peywardarkirin û Sîtî jî bo vî yekê jî hatiye peywardarkirin; dibe sedem ku pêşiya Ferxî bide ber bi lêgerînekê.

Her du destan ji çar beşan pêk tên. Bi herikîneke balkêş çîrok didomin, weke romanekê hatine honandin, dramaturjiyeke bêhempa heye. Helbet weke trajediyekê ji çar perde/beşan pêk tîne.

Beşa ewilî ji rasthatin û nasîna kesana pêk tîne. Ev beş li jorê hatiye nîşandan. Beşa duyem rêwîti û lêgerînek e. Ew beş jî hefteya tê digel beşên seymîn û çaremîn dê bê weşandin. Dê digel beşa seymîn hay ji zanîna her du karakteran bibin, di beşa çaremîn de jî digel Ferx û Gilgamîşî hêdî hêdî dê vegerine li ser xaka xwe û dê hay ji mirovatiya xwe bibin, hay ji dawî û mirina xwe.

"Mîrov bêdûmahîk (bêdawî) nîne, dê dûmahîk û vegera me hemûyan bibe ev xak û welat."

(didome)



Şenyaşare serewedarnayîşê dejan a

Valêre

Şima zî zanê ke 14ê hezîrana 2018î de parlamenterê AKPyî Halîl Îbrahîm Yîldizî semedê raywaştîşî Pîrsûs de keye û dikanî zîyaret kerdêne. Yîldiz û ê ke boça ci dima gêrenê şinê dikana Şenyaşaran zî û keyeyî ra raye wazenê. Munaqêşeyan ra dima dikan de serebût qewimîyeno û Celal Şenyaşar û Adil Şenyaşar bi giranî, Mehmet, Fadil û Ferît Şenyaşarî zî bi hawayêkê şenikî birîndar benê. Emîne Şenyaşar û mêrdeyê xo Haci Esvet Şenyaşar şinê nêweşxane ke domananê xo bivîne. La verê çimanê Emîne Şenyaşare de mêrde û 2 lajê ci yenê qetilkerdene. Ma nê çiyî pêro çapemeniye ra eşnawitî. Ma bêrê mesela ser o.

Dayika Emîne sey pêroyê dayikanê bi zerrî şikiteyan nêeskaye dejê mêrde û domananê xo, xo vîra bikera û 8ê adare de verê edliyeya Pîrsûsî de tewrê lajê xo Ferît Şenyaşarî çalakîya roniştîşî ya ‘edaletî’ daye dest pêkerdene.

Dayika Emîne çiças çimanê xo padena domanê ci yenê verê çimanê aye. Senî domanê xo ardî dinya, senî înan ra hes kerd, senî ê mird kerdî, senî dest bi mekteb kerdî, senî huyayê dayika xo rê, dayika xo senî heskerdêne, senî pîl bîyî û heta roja sîyaye ke domanê aye qaşo ‘sîyasetmedarê’ hetê çekdaran ra ameyî qetilkerdene. Nê heme çiyî saniye bi saniye verê çimanê ci de ganî benî û şenikîya domananê xo ra heta roja sîyaye her çî

newe ra neue beno. Tu dayikêk mumkun nîyo ke domananê xo, xo vîra bikera. Nê çiyî ne vîrê to ra şonê dakiya Emîne û ne zî ti eşkena nê dejî rê dermanêk bivîna. Destê to de tena mendo edalet. Cezakerdişê qatilan beno ke awêk birijno zerrîya to.

Eke rewşa to biameyêne zanayene û dejê zerrîya to hetê qanûnê cezakerdişî û îdarekaranê dewlete ra biameyêne hîskerdene mumkun nîyo ke nê kesê çekdarinî teber de dest û linganê xo biteşênê û bigêrî. Kes xo nêkeno

herinda to. Coka ra kerdoxî bi asanî teber de gêrenî. Înan senî semedê rayêk di rayan hende gonî rijnaye. Zerrîya dayik, cinî, way û birayan dejnaye. Xoverdayîş û waştîşê edaletî ra vêşêr to dest de çiyêk nêmendo.

Dayika Emîne êdî qîrena û dejê zerrîya xo vera nalena. Her qîrayîşê xo de cezakerdiş û edalet wazena. Dayika Emîne vana ‘Çîyo ke hende mi dejneno qey şima qasê serê derzîne nêdejneno. Tena yew deqa xo bikerî herinda mi. Mi di doman û mêrdeyê

xo vînî kerdî. Hem zî semedê yew di rayan. Ez kam cû rê biberma. Şima çiyêko winasî cuyayî? Nê. Şima nêzanê zerrîya mi de çî derdêko sîya û bêderman esto. Semedê hîskerdîşê dejê zerrîya mi, ferzo ke şima zî nê derdan bivîne? Hende çî keraye ser o bêro kera teqena. Êdî ez nêeskena paweyê edaletê miyanê wîrdî lewanê şima vîndera. Eke edalet nêro ca ez do semedê caardişê edaletî çî mi dest ra bêro bikera û doza mêrde û domananê xo ra şêra.’



Fırçeya Şikite

Gulçin Adar

Were bi rojeyê verênan

Çiças aşma Remezanî bêro pîlanê xo ra bi axinêke nê eşnawena, “were bi rojeyê verênan” wexto ez nê eşnawena xemgîn bena. Gelo rojeyê verênî senîn bi ke hende bi hesret yenê yadkerdiş. Ma wina wextêkê rê rast ameyî ke her çî goreyê berjewendîyê xo form girowto û çî heyf nînan ra bawerî zî tesîr bîya.

Ma aşma Remezanî ra derbaz benê. Na aşme, aşmêka pîroz a semedê musulmanan. Na aşme de musulmanî xo pêro çiyê nefsanî ra dûr danê û pakkerdişê fikrî, hîsî û bedenî rê hadreyî kenê. Her çiças miyanê komelî de roje sey ‘feqîran famkerdiş’ bêro zanayîş zî la mana û muhtewayê xo de xeylêk çîyan bi ca

keno. Xora ma tena bi feqîran famkerdişî dir gêrê bidê o wext roje çîra feqîran rê zî bîyo ferz? Goreyê nêzdîbiyayîşê winasî gerek feqîrî roje ra muaf bibîne. Yan zî çîra tena aşmêke feqîran bîyarê xo vîr? Yanî no ramojneno ke tena feqîran famkerdiş nîyo û ma gerek qaydeyê ci bizanê, cigêrayîş bikerê û fam bikerê.

Seke yeno zanayîş her bawerî de qayde û nîzamêke esto. Eke merdim ê qeydayan tam bi ca nêaro yan zî goreyê xo şekil bido û bicivîyo o wext esasê ci ra dûr keweno. No semed ra ganî merdim heqîqetê ci baş bizano û wina têbigeyro. Goreyê ke Quran de ameyo nuştîş; roje verê îslamîyetî zî ameyo girowtî. O wext ra heta nika xeylêk çî vuryayî.

Her çiças vernîya îslamîyetî de bi hawayêke zelal rojegirowtîş senî bîyo merdim nêzano zî la zaf weş eşkeno nimûne wextê zemanê Hz. Mihemedî û nê zemanî ra bido. Goreyê hedîsan Hz. Mihemedî bi çend xurma û zeytûnan fitarî akerdo la nika musabaqaya werdî miyanê musulmanan de esta. Kam hîna zaf sofreyê xo kerd dewlemend û kam hîna zaf forsê werdê xo da la çîyo ke merdim dejneno kesê ke feqîrê reyna yenê peygoşkerdiş û nîne vîrardiş. Feqîrî reyna perîşaniya xo de manenê. Bawermendê ke dewlemendê nê rindî zanê ke derûdorê xo rê berpirsayir ê û ganî paştdayîş bidê feqîr û fuqaran. Labelê tena pîzeyê xo fikrîyenê. Xora bawerîya xo

baş bi ca biardêne ne feqîrî, ne zî bêtêduştî mendêne.

Helbet tena feqîrî ney, heqê kesî nêwerdiş, zûran terkerdiş, vatişê xirabî ra dûrvistiş, çiyê nefsanî ra pakbîyayîş ûsn çîyan rê diqetkerdiş lazim o. La ewro ma ewnîyenê bêtêduştîyêk pîl miyanî komelî de esto. Yê kesê ke xo musulman biname kenê miyanê koşk û sarayan de yê, heq û huqûqê însanan binpay kenê, diznenê, zûran kenê her çî xo rê helal vînenê û nêwazenê xêrcê înan kes nefes bigîro. Hetê bîn ra bi roje û nimajê xo wazenê şarî bixapênê û şar zî yeno xapênayîş. Mezgo ke bêro girêdayîş, raştîyan bivîno zî fekşaşîyan ra vera nêdano. Merdim însanê newînan rê heşe ramojno do vajê rêçe ça de ya. Çike verê pêro çî berjewendîyê xo fikrîyenê. Zulm ra zî haydar ê, nêheqî ra zî û bêtêduştî ra zî haydar ê. La kerkerdiş û korkerdiş înan rê hîna asan û raşt yeno. Çî heyf nêzdîbiyayîşê winasî dir komel ver bi teraşî şin o. Komelêko ver bi teraşî şêro êdî xelisbîyayîşê ci çin o.

Hema ke ma nêresayê verê teraşî her ca de hemverê xirabî ma bibê qalxan, ma haydar bê xo ra û derûdorê xo ra. Ganî çî bawermend çî bêbawermend semedê komelêko têduşt dest bidê yewbînan, xebate bikerê û her bawerî û weşikî rê rêzdar bê. Veng bidê vengê mazluman û zaliman binerd bikerê. Ma wina dinyayêke weş awan bikerê ke êdî ma nêvajê “were bi roj û rojeyê verênan.”



Dewey Ma

Cemîl Oguz

cemilo@diyarname.com

Hîs

Mesela ma vajê kirmancî (zazakî) mîrena. Yew eşkeno ewja ra vengê xo berz bikero:

- Wa bîmîro, mî rê çî?!

Mesela heme ene wa. Mî rê çî?

Dinya de bi hezaran, se hezaran merdimî veyşan û teyšanê. Yew eşkeno ewja ra veng bido:

- Mî rê çî?

Bi mîlyonan tûtê kurdan estê û ê tûtî serê erdê xo de nêşkenê bi ziwanê xo derse bivîne, nêşkenê mekteban de bi ziwanê xo biwanê û binîsunê. Wexto ke ti eney biyarê ziwan, mimkûn û henî goş nêdê to, henî reyna vajê:

- Mî rê çî?

Erê, heme mesela tiya de qedêna: Mî rê çî?

A rast mesela zehf zelal a: Ene mesela meselaya hîskerdîşî ya. Jo hîs nekero merdim nêşkeno bi zor vajo fermo hîs bike. Merdim bi zor nêşkeno verê merdiman bîaçarno.

Mesela ti qet ziwanê xo hîs nêkenê, ti vanê "Ziwan amûrê dayîş û girowtîşîyo, ez wazena bi îngilîzî bidî û bigîrî" û ti ana dewam kenê. A çaxî hendî ziwanê to meydan ra wedarêno û ziwanê îngilîzî kuno şûneyê.

Wexto ke ti ziwanê xo hîs nêkerê ti te ra hes zî nêkenê. Ti zor nêdanê xo ke ê raver berê, bi ê binusnê, biwanê û xeberî bidê. Ti hîs nêkerê ti bi ê tûtanê xo dir nêdanê û nêgînê, ti ziwan nêmojnenê ro înan. Heta enka to ew ziwan zanawo la to nêşixulnawo, la tûtê to go nêzanê zî. Çimkî to nênawito înan.

Ha, ger ti ziwanê xo hîs bikerê, açaşî çî hewce bikero ti kenê. Ti kede zî danê, roj û şewan zî qeybî ê xerc kenê.

Verî heme çî, ma mecbûrê ziwanê xo hîs bikerê çimkî ew ziwanê ma wo. Ay diyinan çî rê ma ziwanê xo vînîkerê? Çîrê ma nêwazin tûtê ma zî pê bimûsê? Ma tûtê ma netenî ziwanêk, di ziwanan, bi hîrê-çar ziwanan bi-zanê go çî înan ra kemî bibo? Bela eks înan rê zî muhîm o ke çende ziwanan bizanê.

Hîs, erê gere ma hîs bikerê. Kirmancî, kurmancî, soranî û zaravayê bînî, heme ê ma yê. Yê ke enî zaravayan bikişê zî ma yê, ê ke eniyan raver berê zî ma yê.

Di heme çî de hîskerdin muhîm o. Merdimê ma hepsan de yê, şarê ma feqîr o, dîrokey ma xerepenê... Qeybî enî heme çîyan hîskerdin muhîm o. Ti hîs bikerê yew reye vernî to de wa, ti hîs nêkerê reyeke bîne vernî to de wa...

Axir hîs, hîskerdin muhîm o. De kamî hîs kerd, kamî nêkerd... Bi zor nêbeno... Ma hîs bikerê zî nêkerê zî dinya dewrê xo de geyrena...




Derûnnasê alman

Carekê zilamekî alman diçe ba derûnnas û jê re dibêje: “Ji biçûkaya xwe de, tir-seke min a mezin heye, her şev ez ji ber wê tirsê nikarim razê. Di serê min de taswaseke wiha heye ku dê mirovek ji bin textê min ê razanê derkeve û min bi-kuje. Her şev ji ber vê metirsiyê nikarim têkevim xew.” Ew mirov diçe ba derûn-nas û çiroka xwe jê re dibêje.

Derûnnasê alman dibêje: “Baş e divê tu hefteyê du caran werî ba min, heta çend mehan tu yê rihet bibî. Ji bo her hevdîtînê, tu yê 200 ewro bidî min.” Mêrikê alman ji bo ku ewqas pereyê wî tune ye qet nema bi ser derûnnas de diçe. Piştî çend mehan carekê ew û de-rûnnasê alman li hev rast tî û derûn-nas dibêje rewşa te çawa ye tu çima nehatî ji bo dermankirinê.

Mêrikê alman dibêje: “Ez niha gelekî baş im û penaberekî sûrî ez di yek hevdî-tinekê de rihet kirim. Min xwarinek dayê û kolayek û wî ez rihet kirim.” Derûnnas dibêje: “Çawa tu rihet kirî, ma derûnnas bû.” Mêrikê alman dibêje na wele ne de-rûnnas bû ew penaberekî sûrî bû. De-rûnnas: “Çawa te ew rihet kir?” Mêrikê alman got: “Ji min re got wî textê xwe yê razanê bifiroşe û livînê xwe deyne erdê, li wir razê êdî nema dtu itirî. Min wiha kir û êdî ew tirs a min ji binî vde çû.”



Tiştanok (mamik)



Gelî hêjayan, tiştanok an jî mamik berê di civa-tan de dihatin gotin. Wê demê şevbêrk û ci-vata gund her şev li odeyekê dibû û dema xwe bi stran, çîrok û çîvanokan derbas dikirin. Yek ji wan jî pîrsa van mamik û tiştanokan bû. Vê hejmarê dîsa me çend tiştanok ji we re amade kirine. Bi hêviya ku bi dilê we bin.

1-Tiştêk min heye•
Çil çit e, çil ber çit e
Çil ode ne û çil mifte
De bêjin ew çi ye?

2-Tiştêk min heye
Çil tilî, çil neynûk
Du can û nefesek

3-Tiştêk heye
Piyana Şamê erdê ket
Din dinê ket
Ew çi ye?

Çavkanî: Mamikên Botanê
Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî

Bersivên me ev in:
1-Qurana pîroz 2- Jina ducanî 3- Brûşk

Zûgotinok

Kerem bikin zûgotinokên me yên vê hefteyê, hûn jî biceribînin û tevî endamên malbatê ji hev û din bipirsin. Lê vê carê em ê çend mînakên ji zûgotinokên listikan binivîsin. De werin em dest pê bikin î pîrsa xwe ya her tim bipirsin.


→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
Beqê, beqê, beqbelûsê
Were lûsê
Çav pehnê
Ez ramûsê

→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
Abailo Bilo bavê min
Tiştêk ketiye çavê min
Xwelî be bihele
Darik be bibeke
Kevir be biteqe

Çavkanî: Pirtûka Zûgotinokan a Mihemedê Kurdo



XAÇEPIRS



JÎ ÇEPÊ BER BI RASTÊ

- 3. Ne xerîb 5. Cihê ku genim lê tê hêran 7. Vexwarineke bi alkol 8. Cînavkeke xwerû ya yekjimar
- 9. Fêkiyeke zivistanê 13. Hunermendekî kurd Mihemed 14. Ax, zemîn
- 16. Bajarekî bakurê Kurdistanê, bi gola xwe navdar e 19. Kom an jî keriyê çêlekan
- 20. Paşdeçekek 21.Hejmarek 22. Serekên êzidiyan an jî mezinên elewiyan.
- 25. Cînavka kesê duyemîn a tewandî 26. Bi ba ketin, ji erdê bilindbûn, bi hewa ketin
- 28. Xebat û têkoşîna ji bo pêkanîna guhertineke mezin


JÎ JOR BER BI JÊR

- 1. Bajarekî rojavayê Kurdistanê
- 2. Wekî, weke
- 3. Bersiva neyênî
- 4. Ne germ
- 6. Bajarekî başûrê Kurdistanê
- 10. Dar an jî hesinê ku didine ser stûyê ga û gamêşan
- 11. Rih
- 12. Alava ku berê rûn û tiştên malê tê de hiltanîn
- 15. Sewaleke ku herî zêde li çolistanê dijî
- 17. Malbata hin zimanan ku erebî jî di nav wan de ye
- 18. Fêkiyeke havînê li Amedê gelekî mezin dibin.
- 20. Paşî, encam
- 23. Rengeke tarî
- 24. Kurt, ne dirêj
- 27. Tûj

Bersiva hefteya borî



Avakirina vegotin û honandina senaryoyê



İlham Bakır

Tiştê ku em jê re dibêjin dîroka mirovahiyê, rêwîti û serpêhatiya hebûna mirov e. Ew rêwîti ye ku ji hebûneke biyolojîk ber bi hebûneke sosyolojîk û psîkolojîk ve pêk tê. mirov ji bo ku hebûna xwe ya biyolojîk bidomîne, wek navgîneke xwe-parastinê civakîbûn bi pêş xistiye û ev destpêka cudabûna mirov a ji gyanewerên wekî din e. Bi vî awayî mirov êdî ne bi tenê heyîneke biyolojîk bû, her wiha heyîneke wisa bû ku ji bo awayên xwe yên hebûnê yên wekî din biparêze mekanîzmayên xwe-parastinê bi pêş dixist. Bi rêya veguhastina agahî, zanîn û ezmûnan mekanîzmayeke xwe-parastinê bi pêş xist. Vê yekê jî gyanewerê ku jê re mirov tê gotin hinekî din kir gyanewerêkî têkel û sofîstîke.

Ol, felsefe, zanist, bîrdozî û huner di tevahiya dîroka mirovahiyê de navgî-nên herî xurt ên xwe-parastinê ne. Mirov ji bo ku zêdetir hebûna xwe ya li rûyê dinyayê watedar bike, pêk bîne û hebûna xwe biparêze di nav lêgerînekê de bûye. Wek encama vê lêgerînê jî, ol, felsefe, zanist, bîrdozî û huner derketin holê. Ji roja ku mirov bi mirovbûna xwe hesiyaye û heta îro xwestiye ku navekî li hebûna xwe bike û ew ji wê rojê heta îro wek pirs û pêdiviyekê pir girîng e.

Vegotina çîrokan, bi rêya çîrokan veguhastina ezmûnên civakî, êş û janên ku hatine kişandin, rêyên ku ber bi bextewariyê ve dibin, heyînên ku veguherandine pîroziyên civakî, nirxan, rê û

rêbazan ragihînin nîfşên pêşerojê, ji bo ku hebûna xwe ya li rûyê dinyayê watedar bike, ev bi hezar salan in komên mirovan ên bi her cureyî yên ku li rûyê dinyayê hatine avakirin, wek amûreke bingehîn a xwe-parastinê bi kar tînin. Ango bi wateyê xwe ya ku pir tê zanîn, çîrok, çîrçîrok û destan ne ji bo buhira-dina demên xweş tînin vegotin û ew amûrên kêfxweşiyê nînin. Lewra ew wek lêgerîna çareserîkirina pîrsgirêkên civakê derketine holê.

Di çîrokên filmên ku dê sînemaya kurdî biafirîne de dê rengêkî vegotinê yê çawa bê bikaranîn, ev vegotinê dê xwediyê teşeyê çawa be, çîrokên van filman dê li gor kîjan pevçûnan bîn

honandin, honakeke çawa, têkiliyê cih û demê ya çawa dê bê sazîkirin; ji bo ku ev hemû bîn diyarkirin, divê paşxaneya çandî ya civaka kurd û erdnîgariya kurdan bê nîrxandin. Divê kevneşopiyên civaka kurd li ber çavan bîn girtin. Ji bo vegotin û domandina kevneşopiyên kurdan amûra herî bingehîn vegotina çîrokan e. Ji ber vê yekê jî divê sînemaya kurdan jî çîrokên rast bihûne û karakterên rastîn biafirîne.

Çanda kurdî li ser erdnîgariya ku şoreşa sazûmankar a mirovahiyê, neolîtîk, lê pêk hatiye, teşe girtiye. Kurd jî wek pîraniya gelên vê erdnîgariyê parçeyek ji vê şoreşê ne û îro mîratgirên wê ne. Çîrokên ku kurd vedibêjin ligel ku di nav-

berê de bi hezaran salan dem derbas-bûye jî, hîna jî li ser şopa vê şoreşê ne. Ji ber vê yekê jî divê sînemaya kurdî ya ku hîna nû teşe digire jî divê bide ser şopa vê şoreşê.

Avaniya civakî ya kurdên ku bi sed-salan dewlet ava nekirine û dûrî kevneşopîya dewletparêz mane xwediyê taybetiyekê demokratîk e ku dijî desthilatdarî, dijî hiyerariyê ye, bi xwezayê re lihevkişî û bi awayekî wekhev têkilî daniye. Sînemaya kurdî ku li gor vê paşxaneyê civakî tevnege de lingekî wê kulek bimîne.

Di encamê de sînema jî rêbazeke çîrokgotinê ye. Berî çîrokê tê nivîsin, paşê ev çîrok bi rêya dîtbarî, bi amûrên dîtbarî

tê îfadekirin. Heger sînemaya kurdî, çîrokên sînemaya kurdî li ser koka xwe şîn nebe, çavê xwe jê bade, berê xwe vegerrîne navendên sînemaya mêtîngeran, ne dikare sinemayekê resen derxe holê ne jî dikare rola xwe ya ku civakê sax bike, rê nîşan bide bîne cih.

Ev nivîs, armanca xwe ya sereke ne ew e ku senaryoke serkeftî çawa tê nivîsandin hîna xwendekarên xwe bike. Armanca vê nivîsê ev e; divê beriya her tiştî bê zanîn ku çîrok gotin, ji bo civakê avakirina hişmendiye ye. Eger hişmendi hêza xwe ji kevneşopîya xwe, ji tekoşîn û pîrozbahiyên xwe, ji nîrxên xwe ya civakî û erdnîgarî negire, çîroka ku derkeve holê dê xizmeta serdestan bike. Her çîroknivîs, her senaryonvîs, her sînemagerê kurd gere çanda xwe, civaka xwe, erdnîgariya xwe, pîrozbahiyên xwe, çîrokên ku berê hatine gotin nas bike û çîrokên ku dixwaze binivîse, filma ku dixwaze bikişîne hêza xwe ji van tiştan bigire, ser van tiştan estetîka xwe ava bike. Û dîsa çîroka ku vedibêje divê ne ji bo otorîteyên hunera serdest, ji bo festîval û xelatan, ji bo gelê xwe vebêje. Divê çavkaniya motivasyonê bibe gel, ne ku bibe navendên hunera serdest. Her du motivasyon, sînemayekê ji hevûdu pir cuda derdixin holê. Dêrê çîrokên sînemayê bi giranî ew e ku hem dixwazin ji bo gel hem jî ji bo otorîteyên sinemayê navendî vebêjin. Ev jî berhemên ku li arafê mane, berhemên nakok û lawaz derdixin holê. Her senaryonivîs berê ku dest bi çîroka xwe bike gerek diyar bike ku çîroka xwe ji bo kî û ji bo çî vedibêje. Ev nivîs di serî de henek van meseleyan dixwaze nîqaş bike.



Bi Îro Showê rexneyên mîzahî dike

■ Qedri Esen

YouTube, malpereke webê ye ku dîmên lê tên barkirin, temaşekirin û belavkirin. Navenda YouTube li bajarê San Brûno yê parêzgeha Kalîforniya ya Amerîkayê ye. YouTube, di 15'ê sibata 2005'an de ji aliyê xebatkarên PayPal'ê (Pergala dirav razandinê ya online) Steve Chen, Chad Hurley û Jawed Karim ve hatiye damezrandin.

Destpêkê bi piranî şîrketên muzîkê ji YouTube sûd wergirtine û qîbên xwe yên muzîkê lê bar kirine. Lê bi demê re naveroka YouTube hatiye dewlemendkirin û di gelek qadan de dîmên lê hatine barkirin. Di demên dawî de jî YouTube bûye alternatîfa qenalên televîzyonan. Gelek kes qenalên takekesî li ser YouTube vedikin û naverok hildiberînin. Li gelek welatan hejmara aboneyên qenalên YouTube yên takekesî bi serîya milyon ketiye.

Di 2012'an de dibe penaber

Ji bilî şîrketên muzîkê di nav kurdan de ev xebat qels in. Hê nû nû bala kurdan diçe ser YouTube. Bi vîrusa koronayê re eleqeya kurdan a ji bo vê yekê zêdetir bû. Bi pandemiyê re gelek qenalên YouTube yên takekesî hatin vekirin û naverokên cuda hatin hilberandin. Yek ji van kesên ku qenala YouTube ya takekesî vekirîye jî Rojnameger Ayhan Êrmiye ye.

Ayhan Êrmiye, di sala 1986'an de li gundekî bajarê Êrmiyeyê yê rojhilatê Kurdistanê hatiye dinyayê. Di sala 2012'an de ji ber zextên rejîma Îranê terka bajarê xwe Êrmiyeyê dike û derbasî bakûrê Kurdistanê dibe. Di sala 2018'an de ji weke penaberekî siyasî derbasî Almanya dibe û niha li wir dijî. Ew di temenekî biçûk de li ser çand û hunera kurdî dixebite û dibe endamê Enstîtuya Ehmedî Xanî ya li Êrmiyeyê.

Ji valahiya qada mîzahê dest pê dike

Li bakûrê Kurdistanê jî li Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) dixebite û çîrokên pêkenokî dinivîse. Herî dawî jî medya civakî bala Ayhan dikişîne û li ser navê xwe qenaleke YouTube vedike. Ayhan di vê qenalê de niha bernameyêke bi navê Îro Show çêdike û bi zîmanekî mîzahî di gelek waran de rexneyan li civaka kurd dike.

Me xwe gihand Ayhan Êrmiye û li ser bernameya wî ya Îro Show a bi mîzahê rexneyan dike, axivîn. Êrmiye, diyar kir ku bi nivîsên mîzahê û sînemayê re mijûl dibe û weke kesekî ku 15 sal in mîzah dinivîse wî tim kêmasiya mîzahê di medyaya kurdan de didîtiye û ji ber vê sedemê dest bi bernameya Îro Showê kiriye.

Bila bibe payîz...

Êrmiye, da zanîn ku gelek kevneşopên tiro-viro, resm û edetên nebaş û taboyên mezîni di nav civaka kurd

hene ku divê werin rexnekirin û têkil-darî mijarê ev tişt anîn ziman. “Ziman û çanda me ya resen di bin bandora medyaya ne bi kurdî de roj bi roj bê-rengtir dibe. Ku pêşiya vê yekê neyê girtin wê demê bi rastî ‘Em ê herin yek bi yek’. Îro Show wê siyasat û siyasat-medaran jî rexne bike. Bila bibe payîz em ê bibînin.”

Di berdewamê de Êrmiye, angaşt kir ku di çanda kurdan de rexnekirin tune ye û di şîroveyên kurdan ên ji bo hunermend û siyasatmedaran de, ji bilî imojîyên dil û gul û bijî-bijî tiştek din nabîne û ev nîrxand: “Em kurd ne

ji rexnedayîn û ne ji rexnekirinê hez dikin. Gava mirov hişmendiya gelên din ku çava hunermend û siyasatmedarê xwe rexne dikin dibîne bi rastî xemgîn dibe.”

Li wargeha penaberan amade dike

Êrmiye, têkildarî bertekên li dijî rexneyên wî yên di Îro Showê de jî got ku heya niha bertekên gelek cidî li dijî wî çênebûne, Îro Show hê di lêlêyên xwe de ye ku bibe lolo wê mala wî xirab bikin, lewma hewl dide hinekî sivik rexne bike da ku hêdî-hêdî amadehî ji bo rexneyên tûj û giran çêbibe.

Der barê şert û mercên çêkirina Îro Showê de jî Êrmiye ev agahî dan: “Ez Îro Showê li wargeha penaberan di odeyekê piçûk de ji pêşkêşvanî û tekstê bigire heya teknîk û montajê bi tena serê xwe amade dikim. Sezona yekemîn wê heya payîzê bidome. Helbet wê guherînen mezin çêbibin. Mixabin bê derfetê destên min girê didin. Min pêdivî bi piştgiriya heye. Îro Show bi rihê xwe yê mîzah û rexne wê her tim wisa be lê bê guman her tim tiştek ji bo sûprîzîkirinê wê hebe. Heke tu bipirsi heya kengî wê bidome ez ê heya mirinê li ber xwe bidim.”



Sîmulasyon: Gelo rastî bi rastî jî rast e ? ²



Bilal Ata Aktaş

Di nivîsa ewil de min bi kurtasî behsa çarçoveya teoriya sîmulasyonê kiribû û hinek bala xwe dabû dîroka wê. Ez ê car bi car dîsa vegerim paşxaneya vê teoriyê. Lê divê timî di bîra me de be ku li ser vê meseleyê rastî û xewn û xeyal ewçend li hev gevizîne ku piştî demekê meriv ji pirsên herî sade û rast-qebûlkirî jî dikeve şikê. Jixwe divê wilo be. Yan na xêra teoriyê namîne.

Di vê nivîsê de jî em ê yek ji pirsên herî sereke ji xwe bikin û bikevin pey bersiva wê: *Gelo rastî, bi rastî jî rast e ?*

Bersiva kurt: Em nizanin.

Ya dirêj: Em heqeten nizanin.

Tiliyên te li ku ne? Tu yê destên xwe nîşan bidî. Baş e, lê çawa dizanî ku ew rast in? Tu yê bêjî rast in çimkî hesta min bi wan heye, wan dibînim, temas dikim, va ye li vir in! Xebera te ye, organên hestkirinê (çav, guh, poz, çerm, ziman) yek ji rêyên herî sereke ye ji bo fahmkirina dinyaya li derdora me. Lê eseh, hestên me ne tenê pênc heb in. Ji bilî dîtîn, bêhnkirin, temas, sehkirin û tahmkirinê gelek hestên me yên din jî hene. Mîsal *hesta kînestetîk* ya *navxweyî* (*proprioception*). Bi saya vê hestê haya me ji tevgerên laşê me çêdibe û em dikarin hevserengiyê daynin di navbera dest û mil û ser û lingê xwe de bêyî ku em li wan binêrin an jî destê xwe bidin wan. Yanî ev hest nîşanî me dide ka laşê me li ku derê ye. Bêyî wê, hiş û laşê me dê du govendên ji hev cuda bigirin. Loma girîngiya wê ji bo jiyanê normal elzem e.

Ji bilî vê hestê, hima qet tune be ji 20 heban zêdetir hestên me yên din jî hene. Lê hemû dirust û tekûz nîn in û zû tî xapandin: *Hesta sarbûn* û *germahiye* (*thermoception*), *hesta êşê* (*nociception*), *hesta hevserengiyê* (*equilibrioception*), *hesta hormonî*, *hesta erdkêşiyê*, *hesta tî* û *birçîbûnê*, *hesta demê*, *hesta hinavî* (organên hundirîn)...

Bi tevahiya van hestan em derdora xwe fahm dikin, wê tecrûbe dikin. Ango em wan wek amûran dixebitînin û agahiyên ku ew tov dikin dişînin mêjiyê xwe.

Mêjî jî van agahiyan bêjing dike û dihele, hê paşê jî li gor encama berdest biryarekê dide. Yanî rawestgeha dawî dîsa mêjî bixwe ye. Ev jî tê wê maneyê ku her tiştê li derdora me, taliya talî di mêjiyê me de wateya xwe digire. Bêyî ku em mêjiyê xwe bi kar bînin, hestên me çiqas xurt bin jî, bi kêrî serê pîvazekê nayên. Nexwe madem em vê pîrsê jî bi bikaranîna hiş û mêjiyê xwe dikin, em ji ku dizanin ku mêjiyê me, me naxapîne? Belkî mêjiyê her kesî gamêşekî wek cûcikekê nîşanî me dide û her cara ku em li cûcikekê dinêrin belkî di rastiyê de li gamêşekî formxerabûyî dinêrin?

Platon, ji tiştên ku em bi hestên xwe fahm dikin re dibêje *Doxa* (agahiya şaş), ji bo yên ku em bi aqilê xwe têdigihîjin re jî dibêje *Episteme* (agahiya rast). Ji ber ku dinyaya li derdora me diguhere, agahiya der barê wê de ji diguhere, lewra divê meriv baweriya xwe bi rastiya hestan neyne. Ji bo Plêton, agahiya eseh, ya bingehîn *idea* ye ku bi tî şert û mercan naguhere. Lê belê heger îdeaya tiştêkî di hişê me de hebe, bi mantiqî hebûna wê zarûrî be, divê forma wê jî bi tu awayî naguhere. Yanî heger di hişê me de telefonêke îdeal hebe, divê her tim vê forma xwe biparêze. Lê yê ku forma îdeayê di hişê me de çêdike dîsa hiş bixwe ye. Wê

demê em çawa dikarin ji sedî sed jê bawer bibin ku hişê me, me naxapîne?

Baş e lê agahî û zanîna tiştêkî, li ku derê mêjiyê me ye? Em çawa bîranînên xwe depo dikin? Mîsal heger tu hevalêkî Mûşî nas bikî, di hevdîtina we ya duyem de çawa tê bîra te ku ew heval ji Mûşê ye? Yanî bi awayekî biyolojîk *çawa bi bîr tîni*? Li gor lêkolînên cur bi cur, bîranînên me li seranserê mêjiyê me belav bûne. Yanî di serê me de cihekî taybet nîne ji bonê. Li hin cihan zehf in, li hinan kêmbin. Lê kîjan cure bîranîn li kîjan kêlekê ye em bi temamî nizanin. Mîsal ger ew hevala te ya Mûşî jin be tu vê agahiyê datîni ku derê, mêr be datîni ku, tam ne diyar e.

Li ser vê babetê paradoksa Theseusî (*the ship of Theseus*) mîsaleke balkêş tîne ber me. Theseus, piştî salan keştiya xwe tîne datîne keştigehê. Bi demê re cihên xurîfî û xerabe yên wê keştiyê tîne guhertin. Keştî ewqasî kevn e ku piştî demekê, bi mecbûrî her derê wê tî guhertin û bi wan parçeyên kevn, keştiyeke din tî çêkirin. Gelo halê hazir keştiya Theseusî kîjan keştî ye? Ev paradoksa hanê yek ji paradoksên herî kevn e ku ji 2000 salî zêdetir di epistemolojiyê de hê jî aktûel e. Aktûel e çimkî bang li nasnameya me ya nazik û şikebar dike ku van

heyaman krîza xwe ya zêrîn diji. Heger em laşê xwe bixin şûna keştiyê û sibê disibê bi saya teknolojiyê, mêjiyê me jî tê de, yek bi yek organên xwe biguherînin, wê demê em dibin çi? Ji wan organên bermayî jî însanekî din pêk bînin wê *çaxê kîjan ez, ez im*? Ji Heraklîtosî bigire heya Arîstoyî, ji wir xwe berde heya John Locke û Thomas Hobbesî, gelek kes bi argûmantên cihêreng hewl dane çareseriyekê peyda bikin ji bo vê paradoksê. Li gor Arîsto, keştî neguheriye çimkî mebesta wê dîsa eynî maye: ya berê jî ya nû jî yê Theseusî ne. Nexwe keştiya bi bermayîyan hatiye çêkirin ya kê ye?

Gelo em ji bo mêjiyê xwe jî heman guhertinan bikin, bîranînên me jî ji dest diçin yan na? Yan jî mêjiyê me çiqasî were guhertin bîranîna tiştêkî spesîfîk jî pê re diçe? Li gor xurtbûna bîranînê diguhere. Mîsal heger em %2'yê mêjiyê te jêbikin û derxin, dibe ku tu hevalê xwe yê mûşî ji bîr bikî, lê heger em %30 jî jê derxin dibe ku tu strana ewil a Ezîz Weyşî ji bîr nekî. Hemû girêdayî hêza bîranîna te ye. Baş e lê em herî zêde di mêjiyê xwe de dikarin çend heb an jî çiqas bîranînan bigirin? Li gor Paul Reberê derûnnas, bi qasî 2.5 petabayt. Yanî tu di televîzonê de kanalekê vekî û 300 sal bihêlî bila bixebite ew ê ancax


bike 2.5 petabayt. Qapasîteyeke qerase ye lê belê bêserûber nîne. Yanî qels jî be xurt jî be, hiş û mêjiyê me bi awayekî sînordar e. Tiştêkî sînordar jî çawa dikare fikr û ramanên bêhed û hidûd biramîne û jê bawer bike? Ku heger fikr û ramanên bêhed û hidûd bi rastî jî bêhed û hidûd bin. Nîn in, çimkî tiştê herî sînornenas jî bi hişê me sînorkirî ye. Hişê me yekane sermiyan e di destê me de û em tê de asê mane. Em xwe li çol û çiyayan jî bixin, mikroskop û teleskopên hêrî bihêz jî bînin, divê van agahiyan bi mêjiyê xwe biçînin û biryarê bidin. Jixwe rêyeke din bi awayekî teknîkî ne pêkan e. Nexwe ger em çi jî bikin, nikaribin ji sînorên mêjiyê xwe derbas bibin, wê demê em ê bi tu awayî nizanibin ka rastî bi rastî jî rast e.

Navê vê paradoksê *bedhalê eznavendî* (*egocentric predicament*) ye ku sala 1910'î ji hêla Ralph Barton Perry ve hatiye formulekirin: *Her tiştê ku em dizanin bes berhemêke mêjiyê me ye*. Ev nakokî bala bavê pragmatîzmê, Charles Sanders Pierce jî dikişîne û lewra cuda-hiyek datîne navbera *dinyaya rast û ya hestkirî* (*phaneron*). Dibêje di navbera her du dinyayan de perdeyek heye û tiştên ku ji dinyaya rast tîne, bivê nevé bi vê perdeyê tîne parzîndanin, filtrekin. Loma tiştên ku em dibînin, ne yên dinyaya rast in, lêbelê yên *phaneronê* ne. Yanî rastiya wan tewîyaye û sîmulekirî ye.

Ji bo vê baweriyê form û formulasîyonek jî heye: Solîpsîzm (solipsism). Peyrewekî vê baweriyê dê bêje *bi tenê ez heme û hemû tiştên derveyî min îlîzyonên hişê min in*. Bi tu awayî rêyeke zanistî tune ye ku meriv solîpsîstan qanî bike ka dinyaya li derveyî hişê wan heye an na. Ekola ku li dijî vê baweriyê derdikeve û dibêje tiştên li derveyî hişê me jî hene realîzm e. Li gor realîzmê tu ji holê rabî jî dê stêrk bibiriqin, çêlek biçêrin, kûçik biewtin. Lê belê tu nikarî bi temamî bizanî ka realîzm rast e yan na. Tê tenê bikaribî bawer bikî ku rast e.

(*didome*)

Têbînî: Nivîsa hanê xwe bi piranî spartîye xebata Vsaucyê ya bi navê "Is anything real?" Ji bo çavkaniyeke têr û tije hûn dikarin lê binêrin.



Necat Ayaz

Ziman tune be şer ji bo çi ye?

Li gelek aliyên cîhanê, di dozên rizgariya neteweyî de ziman wekî qadeke têkoşînê hatiye qebûlkirin. Ji ber girîngiya wê ya di mobîlîzasyona etnîk de, ziman di heman demê de wekî alaveke xwedî hêza siyasî jî hatiye dîtin. Yek ji welatê ku vê rastiya ziman bûye mijara teoriya rizgariyê, Îrlanda ye. Teorîsyenê ziman û siyasatê David Patrick Moran di 1905'an de bi wan gotinên balkêş riya şoreşa Îrlandayê nîşan daye:

Dema jin û mêrên îrlandayî ligel îngilîzî bikaribin bi zimanê îrlandî biavixin, wê demê neteweyeke heqîqî ya îrlandî pêk tî. Êdî ne mimkûne hêza aboriyê, topên giran an leşkerên Qraliyeta Brîtanyayê bikaribin vê nete-

weyê tune bikin.

Moran gaveke din jî bi pêş de diçe û dibêje "Gan teanga, gan tîr" angî "Eger ziman tune be, netewe jî tune ye." Bi gotîneke din, dema ziman tune be alozî ji holê radibe û lewma jî êdî tiştêkî ku mirov di oxira wî de şer bike namîne. Ev dîtînen li gorî dema xwe têra xwe radîkal bûn, li Îrlandaya di dagirkeriya Brîtanyayê de ji aliye gelek kesan ve dihat şopandin. Teorîsyenên rizgariya ziman û welat bi hev ve girêdîdan, riya rizgariya welatê bindest bi berhemên xwe ronî dikir.

Her çiqas her du hêman di nav hev de hatibûn formulekirin jî, di pratîkê de siyaseta serxwebûnxwaz û tevgera ziman ji hev cihê bûn. Siyaseta nete-

weyî ji sedsala 19'emîn û şûn de îngilîzî bi kar dianî û partiya serxwebûnxwaz Sinn Fein li ser vê kevneşopiyê şoreşê birêxistin dikir. Zimanperweriya radîkal a tevgera ziman û pragmatîzma siyasatê her dem dibû sebeba nakokî û nîqaşan, lê bilindbûna alozî û tansiyonê ya di navbera her du alîyan de li dewsa zîrêrê bide xebatan, doza rizgariya neteweyî xurtir dikir. Siyasat bi bernamêyeke pêşverû û antî-kolonyalist gel birêxistin dikir û tevgera ziman jî hişmendiya parastina ziman di nav heman gelfî de belav dikir.

Piraniya dîrokanên li ser mijarê di wê baweriyê de ne, eger xebatên tevgera ziman tune bûya û netewperweriya îrlandî ewqas li giravê belav

nebûya, negihîştina asta girseyî û wê siyaseta serxwebûnxwaz nikaribûna hêza kolonyalîzma brîtanî tîk bibira. Ji ber vê, mirov nikare bêje serxwebûna Îrlandayê bi tenê bi saya siyaseta îngilîzîaxêf a welêt pêk hatiye. Helbet hişmendiya xurt a dîrokî, hebûna Dêra Katolîk, pozîsyona cografîk jî bi serfiraziya netewperweriya îrlandî faktorên erênî bûn, lê digel van jî, rola aktivîstên ziman di têkoşîna rizgariyê de diyarker bû.

Dema mirov bi vê perspektîfê li têkoşîna li Bakur binêre, dikare hin tespîten balkêş bike. Li vî parçeyê herî mezin ê welêt, 40 salên dawî, bi têkoşîna siyaseta kurdan derbas bûye. Lê vê axa ku gelek rêxistinên siyasî ji nav xwe derxistine, heta niha nebûye xwe-

diyê tevgera ziman. Ev jî bûye sebeb ku di têkoşîna neteweyî de siyasat bi tena serê xwe bê hiştin û ji hevkarî û zextên tevgera ziman bêpar bimîne. Encamên vê rastiya kambax, hem ji bo kurdî û hem jî ji bo nasnameya neteweyî ji texmînan wêdetir hilweşîner e. Kurdiya bêxwedî mayî, ji ber polîtîkayên dewletê û hevkarîya çîna navîn a bi asimilasyonê re li ber tîkîyên ye. Ev jî nasnameya neteweyî deforme dike û bi vî awayî jî dibe tîkîyên rizgariyê dixê nav xetereyê. Slogana "Gan teanga, gan tîr" a li Îrlandayê hatibû gotin tam jî rewşa Bakur îfade dike: Ziman tune be, netewe jî tune ye! Û em gaveke din jî bi pêş de biçin: Ziman tune be şer ji bo çi ye?